


# ÇANDNAME

E-KOVARA ÇANDA KURDÎ YA MALPERA WWW.CANDNAME.COMÊ • JIMAR 5 • 05/2021

## LI PEY ŞOPA BAV Û KALAN BI RENG Û DENGÊN JÎYANÊ

**REXNEGIRÊ EDEBIYATA KURDÎ LOKMAN POLAT**
KOVARA ÇANDNAME

**PIŞTÎ VEGIRTINA KORONAVÎRUSÊ REWŞA TENDURISTÎYA LAŞ**
FZT. MUSTAFA ÖNAL

**BI BIJIŞKEKÎ DILDARÊ ÇANDA XWE RE: DR. ESER ÇETÎN**
HEVPEYVÎN: MELA MIHYEDÎN

**BI EVÎNDAREKÎ ZIMANÊ KURDÎ RE: FIRAT CEWERÎ**
KOVARA ÇANDNAME

# BI SILAVÊN GERM

## JI EDÎTORYAYÊ


ÇANDNAME

e-kovara çanda kurdî
ya malpera www.candname.comê
jimar 5 · 05/2021

Xwedî û Berpirs
**Firat Bawerî**

Edîtorya
**Paşa Amedî**
**Ridwan Xelîl**

Bergsazî û Rûpelsazî
**GrafiKURD**

Wêneyê Bergê
**Murat Adiyaman**

Navnîşan
candname.com
candname1@gmail.com
candnamekovar@gmail.com
candnamemalper
candnameCom
candnameTV

Nivîskar ji nivîsên xwe,
Xwendevan ji xwendina xwe berpirs in.
Lijneya kovarê li ser nivîsan dikare
serrastkirin û guherînan bike.
Her nivîsa ku hatiye şandin
dibê ku newê weşandin.


*Xwendevanên Hêja û Birûmet;*

Kovara Çandnameyê bi jimara xwe ya pêncem derket. Li kovargeriya kurdî pîroz be. Dîse kovara me bi mijarên curbicur û rengînbûna xwe bûye keşkuleke kelepora medern û ya klasîk. Bo hemû nivîskarên xwe re sipasîyên xwe dişînin. Di nav bazarek wilo kesat de bi dildarî piştgiriyê didin kovara me. Dîse em sipasîyên xwe bo hemû şopînerên xwe re dişînin ku di vê bazarê de berhemên me biqîmet dikin.

Bi hinceta weşîna jimara pêncan ya Çandnameyê, Meha remezanê û cejna wê li misilmanan, 1ê Gulanê Cejna Karkeran li hemû xwedî kedan, 15ê gulanê Cejna Zimanê Kurdî li hemû kurdan pîroz dikin.

Di vê jimarê da van hevalan bi nivîsên xwe piştgirî dan me:

Kovara Çandname bi Hevpeyvîna **Rexnegirê Edebiyata Kurdî: Lokman Polat,** Mela Mihyedîn bi hevpeyvîna **Bijişkekî Dildarê Çanda Xwe: Dr. Eser Çetîn,** Mustafa Rêzan bi nivîsa **Rêbaza Fêrkirinê Ya Xanima Maria Montessorî,** Fzt. Mustafa Önal bi nivîsa **Piştî Vegirtina Koronavîrusê Rewşa Tenduristîya Laş,** Kovara Çandname bi hevpeyvîna **Evîndarekî Zimanê Kurdî: Firat Ceweri,** Qudbettîn Kerboranî bi nivîsa **Lîstikên Herêma Kerboranê An Lîstikên Herêma Torê,** Fewziyê Endezyar bi nivîsa **Damezirandina Yekemîn Radyoya Kurdî,** Mihemmed Çavkesk bi nivîsa **Gelo Jibîrkirin Çi Wextî Dest Pê Dike?,** Rojbîn Ozkan bi nivîsa **Çîrûskên Evînê**, Paşa Amedî bi nivîsa **Ya Ji Bo Xwedê Min Zikir Bikira,** Yusuf Agah bi nivîsa **Şîroveya Helbestên Ehmedê Xanî,** Zîwer Îlhan bi nivîsa **Kurdopiya Îslamopya û Nîntopya,** Ersîn Tek bi nivîsa **Çend Gotin Li Ser Zanistê,** Dilazad ART bi xebata **Kronolojîyeke Rewşenbîrî Û Têkçûyî,** Kovara Çandname bi **Lîsteya Pirtûkên Zarok û Nûciwanan**, Faik OCAL bi nivîsa Her **Xalî Bi Çîroka Xwe Ve Dihat, Bi Çîroka Xwe Ve Diçû** tevlî kovara me bûne.

Bi hevîya gelek jimarên din bi xatirê we.

*Edîtoryaya Çandnameyê*

# NAVEROK

**Rexnegirê Edebiyata Kurdî Lokman Polat**
Kovara Çandname ........ 04

**Hevpeyvîn Bi Bijîşkekî Dildarê Çanda Xwe Re: Dr. Eser Çetîn**
Hevpeyvîn: Mela Mihyedîn ........ 11

**Rêbaza Fêrkirinê Ya Xanima Maria Montessorî**
Mustafa Rêzan ........ 21

**Piştî Vegirtina Koronavîrusê Rewşa Tenduristîya Laş**
Fzt. Mustafa Önal ........ 26

**Hevpeyvîn Bi Evîndarekî Zimanê Kurdî Re: Firat Cewerî**
Kovara Çandname ........ 33

**Lîstikên Herêma Kerboranê An Lîstikên Herêma Torê**
Qudbettîn Kerboranî ........ 38

**Damezirandina Yekemîn Radyoya Kurdî**
Fewziyê Endezyar ........ 41

**Gelo Jibîrkirin Çi Wextî Dest Pê Dike?**
Mihemmed Çavkesk ........ 43

**Çîrûskên Evînê**
Rojbîn Ozkan ........ 45

**Ya Ji Bo Xwedê Min Zikir Bikira**
Paşa Amedî ........ 49

**Şîroveya Helbestên Ehmedê Xanî**
Yusuf Agah ........ 52

**Kurdopiya Îslamopya û Nîntopya**
Zîwer Îlhan ........ 54

**Çend Gotin Li Ser Zanistê**
Ersîn Tek ........ 58

**Kronolojîyeke Rewşenbîrî Û Têkçûyî**
Dilazad ART ........ 62

**Lîsteya Pirtûkên Zarok û Nûciwanan**
Çandname ........ 70

**Her Xalî Bi Çîroka Xwe Ve Dihat, Bi Çîroka Xwe Ve Diçû**
Faik OCAL ........ 76



# REXNEGIRÊ EDEBIYATA KURDÎ LOKMAN POLAT

A herî giring ziman e. Ziman hebûna miletan/netew eyan e.

Kovara Çandname:

Qasî ku kanî derheqê xwe de agahiyan bidî, em dixwazin cenabê we naskirin bidin, bila ciwan nasbikin li ser kovarê. Hûn bi kurtasî kanin xwe bidin nasîn?

Lokman Polat:


Ez di sala 1956an de, li Licê –navçeya/qeza Diyarbekirê- hatime dinyayê. Ez çend car hatime girtin û berdan.

Di dema cunteya leşkerî a ku Kenan Evren serê wî dikûand û ew bûn desthilatdar, sazûmaneke

Min wek hejmar herî pir nivîs di malpera "Çandname" de nivîsiye.

**14 romanên min hatine weşandin û du romanên min jî li ber çapê ne dê di sala 2021ê de werine weşandinê.**

mîlîtarîst pêk anîn, di wê demê de di giyaba min de deh sal û nîv ceza dane min. Min beriya sala 1980yî li welat belavokên siyasî û nûçeyên siyasî dinivîsand, tekstên semînerên îdeolojîk û siyasî amade dikir. Di sala 1984an de ez hatim Swêdê. Li Swêdê min dest bi nivîsîna kurteçîrokan kir e. Gelek kurteçîrokên min di rojname û kovarên cure yên kurdan de hatin weşandin.




Kurteçîroka min a yekem di rojnameya "Roja Welat" de û a duyem jî di rojnama "Kurdîstan Press" de hatin weşandin.

Hetanî niha 37 pirtûkên min derketine. 4 pirtûkên min ji kurdî li tirkî hatine wergerandin. Pirtûkên bi kurdî 14 roman û 12 pirtûkên kurteçîrokan in. Yên din jî lêkolîn û nirxandinên berhemên edebî ne. Min ji bo zarokan jî 4 pirtûk wergerandiye kurdî. Min di sala 1995an ta sala 1998an kovara kulturî û lîteraturî HELWESTê weşand. 12 hejmarên kovarê derketin. Min paşê ji bi navê 'RONÎ' hejmarek kovareke çandî, edebî weşand.

Min li ser 160 romanên kurdî nivîsên danasîn, nirxandin, şîrove û analîz nivîsiye û di 5 pirtûkên cuda de weşandiye. Di hêla afirandina romanên kurdî û pirtûkên çîrokên kurdî ên nûjen de rekor di destê min de ye. Yanî di nav nivîskarên kurdên bakur de yê herî pir roman û pirtûkên çîrokan nivîsiye ez im.



14 romanên min hatine weşandin û du romanên min jî li ber çapê ne dê di sala 2021ê de werine weşandinê. Ez bi biryarim, hetanî ez xweş bin ez ê rekora afirandina pirhejmariya romanên kurdî nedime yekî din. Niha jî di destê min de romanek heye, ez dinivîsim.

**Kovara Çandname:**
**Jiyana we de tiştên herî zor çi bûn?**

**Lokman Polat:**
Ji bo xebata afirandina berhemên edebî/wêjeyî, ji bo xwendin û nivîsînê zahmetî ev bu ku; weke hemû nivîskarên kurd ez jî ji bo debara malbata xwe di karxaneyê/fabrîqê de dixebitiyam, min kar dikir û di gel wê jî bi karê nivîsînê re mijûl dibûm. Ez pirê şevan hetanî saet 2ê şevê li malê dixebitiyam, min dixwend û dinivîsî û serê sibê saet 6 radibûm diçûme kar. Helbet ev ji bo min zahmetî bû.

Di afirandina berheman de zahmetiyeke din jî, weke nivîskarên kurdên bakur ez jî di dibîstanan de fêrê xwendin û nivîsîna kurdî nebûm, bi îmkanê xwe û bi daxwaza dilê xwe min xwe fêr kir û dest bi xwendin û nivîsîna kurdî kir. Helbet ez ji malbata xwe fêrê kurdî bûbûm û di navçeya Licê de ji xwe hemûkesan bi kurdî diaxifî.



Lê, fêrbûna nivîsîn û xwendina kurdî, fêrbûna gramera, hevoksazî û tiştên din ez li Swêdê dîsa jî bi îmkanên xwe fêr bûm.

Di dema beriya salên 1980yî de min çar, pênc pirtûkên kurdî xwendibû û hew. Ew jî pirtûkek Cegerxwîn, 3 pirtûkên kurdên Kafkasyayê û pirtûkek Mehmed Emîn Bozarslan bû. Lêbelê li Swêdê hejmara weşandina pirtûkên kurdî zêde bû û çi pirtûka kurdî derket min kirî û xwend.

Îsal 2021. Sîsaliya nivîskariya min e. Min pirtûka xwe ya yekem ya xwerû bi kurdî di sala 1991-an de li Stockholmê / Swêdê weşand. Navê pirtûka min "Evîn û Jiyan" e. Ev pirtûka kurteçîrokan e. Helbet min beriya weşandina vê pirtûka xwe ya yekem a bi kurdî, min bi kurdî nivîs, gotar û kurteçîrok dinivîsand û di kovar û rojnameyên kurdî / kurdan de diweşand. Lê, weke pirtûk pirtûka min a yekem ya bi kurdî ev a ku min li jor bi nav kir bû. Lewre jî ez nivîskariya xwe ji sala weşandina pirtûkê, anku ji sala 1991-an dest pê dikim û îsal sî saliya nivîskariya min e.

Hejmara nivîsên – gotarên – min bi sedan in. Min hemû nivîsên ku di masmedia kurdî de – di kovar, rojname û malperên kurdî / kurdan de – derketine nejmartiye, lê ez texmin dikim hejmara nivîsan ji 500î zêdetir e, belkî jî nêzîkê hezarî ye. Min wek hejmar herî pir nivîs di malpera "Çandname" de nivîsiye. Beriya ku hêj malpera Çandnameyê dest bi weşana xwe nekiribû, min di malpera "Kulturname" de û di malpera "Mehname" de gelek gotar nivîsîbû. Wek weşanên matbû ku li ser kaxiz derdiketin jî, min herî pir nivîs di rojnama "Roja Welat" a ku li Almanyayê derdiket, rojnama "Hêviya gel" û kovara "Helwest" de nivîsî.



**Kovara Çandname:**
**Ji bo ciwanan çi pêşniyaz dikin?**


**Lokman Polat:**
Ji bo ciwanan pêşniyaza min divê bixwînin, bi kurdî biaxifin. Li ziman, çand, wêjeya kurdî xwedî derkevin. Dîroka kurd û Kurdistanê baş fêr bibin, bizabin ku kurdan di dîrokê de çi zahmetî kişandine, çi zilm û zordarî dîtine.

A herî girîng ziman e. Ziman hebûna miletan/neteweyan e. Ziman nebe, miletbûn nabe. Di pêvajoya pêkanîna miletbûyinê de ziman bingeh e. Ziman haceta jihevûdu fêmkirinê, ramanê, edebiyatê, çandê û hemû şêwe pêşveçûnê ye.

Wek mînak; Edebiyat zanîstiye, ew şaxekê hunerê ye. Malzemeyê edebiyatê ziman e. Edebiyat bi haceta zimên dibe huner. Çawan ku haceta muzîkê deng e, yên wêneyê reng e û xêzik e, yê peykerê kevir û tunç e. Û çawan ku vana hemû şaxên hunerê ne, edebiyat jî weha şaxekê hunerê ye û bi ziman ava dibe. Ziman, çand û edebiyata neteweyekî hebûna wî neteweyî ne. Neteweyek ku zimanê xwe, çanda xwe, edebiyata xwe wenda bike, ew bi xwe jî wenda dibe, di nav neteweyên din de dihile, asîmîle dibe. Yên ku neteweyan li ser lingan dihêle ziman, çand û edebiyata wî neteweyî ye.

Niştimanperwerî bi li xwedîderketina ziman û edebiyatê dest pê dike. Roman, berhemek pir hêjaye di wêjeyê de. Her weha, roman barkêşê gotara nîştimanperweriyê ye.

Ji xwe îspata vî tiştî berhemên edebî yên cîhanêne ku wan berheman di pêvajoya pêkanîna hestên niştîmanperwerî de roleke girîng leyistine.










Edebiyata kurdî ya klasîk jî roleke sereke di pêkanîna hest û ruhê welatparêziyê de leyistiye. Bavê neteweperestiya kurdî Ehmedê Xanî ye û berhema wî ya nemir Mem û Zîn e. Dîwana Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û yê jî roleke girîng di pêkanîn û geşbûna hestên netewî de leyistine.

Edebiyat wek her tiştên însanî, berhemeke mirovahiyê ye û hîmê xwe ji jiyanê digre. Berhemên edebî jîndar in, ji nav jiyana însanan û ji xeyalên mirovan tên afirandin. Di edebiyatê de ziman bingeh e; ziman nebe edebiyat nabe. Lê, dewlemendiya zimên jî bi têkiliyên bi edebiyatê ve girêdayî ye. Bi karanîna zimanê edebî, ew ziman hîn pêş dikeve, bi goşt û xwîn dibe, bi ruh û can dibe, jîndar dibe. Pêş ve diçe.

**Kovara Çandname**:
**Nav kurdan de tiştên herî elzem/pêwîst çi ne? (Çendekan kanin bibêjin)**

**Lokman Polat**:
Nav kurdan de tiştên herî elzem/pêwîst di serî de divê kurd ji hevûdu hez bikin. Qîmet û rûmeta hev bigrin. Ji hevûdu re hesûdî, dilreşî nekin. Divê kurd pêşî bi kurd re bibe bira. Di nav çar parçeyên Kurdistanê de biratiya kurdên herçar parçeyan biparêzin. Li başurê Kurdistanê pêşveçûneke ber bi dewletbûnê ve heye, divê kurdên hemû parçeyan pêngavên ber bi dewletbûnê ve biparêzin, piştgirî bikin.

Li bakurê Kurdistanê, di warê ziman û gramera kurdî de çiqas xebat bê kirin û pirtûkên lêkolînerî bêne weşandin ewqas baş e.



Hetanî ku kurd bibin serbixwe yan jî federe dewletek hewcedariya wan bi hertiştî heye. Dema kurd li bakurê Kurdistanê bûn serbixwe yan jî federe dewlet dê îmkanên berfireh bikeve destê wan û bi wan îmkanan dê bikaribin ji hertiştî re çareserî bibînin.

Niha pêwistiya kurdan netenê bi ferhengeke mezin heye, di gel vê pêwîstî bi gelek tiştên din jî heye. Herweha Ansîklopedîa kurdî, ferhenga edebiyata kurdî, dîroka lîteratura kurdî, antolojiya romana kurdî û hwd.

Ez spas dikim ku we firsend da min ku ez di derbarê van pirsan de dîtinên xwe pêşkêşê xwendevanên kurd ên kovara Çandname bikim.




HEVPEYVÎN

# Bijişkekî Dildarê Xak, Civak û Çanda Xwe: Dr. Eser Çetîn

HEVPEYVÎN: MELA MIHYEDÎN



Wekî netew em di gelek qadên jîyanê de li paş mane. Ji bo pêşketinê ji me re xebat pêwîst in. Divê em xwelîya li ser xwe biavêjin û xwe ji bo xebatan amade bikin. Divê em di her qadên jîyanê de xwe nîşan bidin. Bi saya hin canik û camêran êdî ev rewş hêdî hêdî diguhere. Gelê me dixwînin û xwe di gelek qadên jîyanê de û bi xebatên cuda cuda tînin meydanê. Yek ji van camêran Dr. Eser Çetîn e.

Dr. Eser Çetîn ji bo civaka me xebatên hêja dike. Ji bo tenduristîya rast û dirist me hişyar dike.

Bi saya wî civaka me li ser tenduristîyê fêrî gelek xalên girîng bû. Dr. Eser tenê ne li ser tenduristîyê her wiha li ser şano, muzîk, çand, huner û muzîkê jî dixebite. Bi kin û kurtasî ew camêrekî pir alî ye û li ser gelek beşên cuda cuda xebatan dike.

Me xwest em wî ji nêz ve nas bikin û bidin naskirin. Me pirsên xwe ji cenabê wî kirin û wî jî bersiv da pirsên me

**Bi ya min bê eşq û evîn jîyan pûç vala ye. Mirov bi evîn nejî û kar û barên xwe wisa neke nikare tiştekî hêja derxe holê û nikare jîyanê xweşiktir bike**

**Tu ji me re dikarî behsa xwe bikî? Dr. Eser Çetîn kî ye?**

Ez ji dilê axa xwe me. Ji gundekî deşt û berîya Dêrika Çîyayê Mazîya Mêrdînê ji gundê Heboşîyê me. 31 salî me û ev 18 sal in ez li Amedê dijîm lê her dem lingekî min li gund e. Ez pisporê bijîşkîya malbatê me û di heman demê de lîstikvanekî şanoya NÇMa Amedê me. Lê ji ber pandemîyê ez niha bêtir bi karê xwe yê doktorîyê li ber çava me. Ez ji jîyanê û bedewkirina wê pir hez dikim. Miroveki ji dil, jêhatî û têkoşer im.

**Tu karê xwe bi eşq û evîn dikî. Melayê Cizîrî eşqê sedema her tiştî dibîne. Gelo eşqa bijîşktîyê kengî di dilê te de şax veda?**

Bi ya min bê eşq û evîn jîyan pûç vala ye. Mirov bi evîn nejî û kar û barên xwe wisa neke nikare tiştekî hêja derxe holê û nikare jîyanê xweşiktir bike. Ez tu carî ji bîr nakim, dîya min rojekê nexweş bû. Dinalîya û êş dikişand. Lê nediçû nexweşxanê. Hem ji bo pere lê neçe û hem jî ji ber ku tenê bi Kurdî dizanîbû. Ez pir li ber dîya xwe diketim û min dixwest ez jê re bibim derman. Min di hundirê xwe de digot ez ê rojekê bibim doktor û nehêlim dîya min nexweş bikeve û êşê bikşîne. Dîya min bû lê sembol û nîşaneya hemû dayikên me Kurdan bû ew. Ji wê demê û vir ve, evîna doktorîyê di dilê min de şax veda.


**Te çawa biryar tu yê bibî bijîşk? Di hilbijartina pîşe de kî ji te re bû alîkar?**

Wekî tê zanîn pîşeya bijîşkîyê di civakê de pir li ber çavan e. Ji bo vê yekê jî bala min kişand lê ji xeynî wê jî pir sedem hene.

Em deh xweh û bira bûn. Dê û bavê min pir kar dikirin ji bo xwendina me. Min dixwest ez di siberojê de alîkarîya dê û bavên xwe jî bikim.

Wekî din jî ez xwendekarekî jîr û jêhatî bûm. Dersên min pir baş bûn. Min xwest beşek hem di nava civakê de li ber çav be û hem jî hêja be ez bixwînim. Min dixwest ez mirovan baş bikim.

Ji bo ez bikaribim dayik û bavên me yên ji ber nezanîna zimanê fermî di nava êşê de digevizî û nikarîbûn biçûna nexweşxaneyê fêm bikim û ji wan re bibim derman jî min bijîşkî hilbijart.



**Kurdên me ji bijîşkan pir hez dikin. Hema bêje hemû kurdên me dixwazin zarokên wan bibin bijîşk. Ev heyranî me ji ku derê tê?**

Doktor hem zêde dixwînin û hem jî divê asta wan a xwendinê û serketina wan a azmûnan pir baş be. Mirov diwazin zarokên wan jêhatî û baş bin. Wekîdin jî dixwazin aborîya zarokên wan jî baş be ku hem bikaribin alîkarîya malbata xwe bikin û hem jî bikaribin jîyanek hê rehet bijîn. Lê ev ne tişteki zêde rast e, lewre ji bo pere û aborîyê karên hêsantir û cûdatir hene. Malbat dixwazin nekevin ber dest û lingan û kesên bikaribin li wan binêrin hebin. Ev jî daxwazek pir di cî de ye û heke zarokên wan bibin doktor wê baştir li malbata xwe binêrin.

**Niha vîrûsa koronayê dinya tarûmar kirîye. Lê di demên kevin de jî gelek caran vîrûs derketin. Korona biqede jî di pêşerojê de vîrûsên nû wê derkevin. Ji bo rewşên xirab dernekevin çi kar dikeve ser milê mirov û dewletan?**

Belê, wisa ye. Korona jî wekî zeqemê wê bibe nexweşîyek vegir a ji rêzê. Divê mirov zêde bela xwe li xwezayê nede û xisarê nede ajal û nebatan. Mirov çi qas bi wezayê bilîze wê ew qasî jî vîrûs û nexweşîyên nû derkevin holê.

**Dema te dest bi kişandina vîdeoyên kurdî kir ji derdorê bertekên çawa hatin? Ji alîyê dewletê û ji alîyê civakê ve rexne an jî alîkarî çêbû an na?**



> Ez xwe li kubarî û delalîya Kurdî digirim. Li ser hunerê difikirim û ji bo şanoyê fikir û çîrokan dinivîsim. Rojnivîska min jî rêhevalek min e. Û jixwe xebatên ez bi Kurdî dikim û belav dikim jî hêzê dide min.

Bi rastî jî eleqeyek pir mezin heye û ev nêzîkatîya xweş her berdewam e. Pir kêfa min ji vê yekê re tê. Ez miroveki ji rexneyan re vekirî me. Loma jî rexneyan ji şopîner û dostên hêja digirim. Ev yek min serkeftîtir dike û asoya min bêtir rengîn dibe. Tu astengî û neyînî jî çênebûye heta niha. Ez bi awayekî rêkûpêk bi zimanê xwe yê dayikê, bi Kurdîya kezeba dilê xwe xebatan dikim. Ev tiştekî pir rewa û normal e. Ji ber ku mirov rûyê min û axaftina min jî dibînin bêtir ji min bawer dikin û hez dikin. Ez bi hêvî me ku alîkarîya hêjayan wê her berdewam be.

**Ji bo meriv xwe ji vîrûsa koronayê biparêze divê meriv çi bike? Tu bijîşk î û ji gelek mirovan bêtir nêzî vîrûsê yî. Tu xwe çawa diparêz î?**

Jixwe ev salek e ji bo koronayê, em qala xweparasinê dikin. Li ser vê mijarê bi hûrgilî min vîdeoyên youtubê jî çêkirine. Tedavîya sereke nehiştina derketina nexweşîyê ye. Ev ji bo hemû nexweşîyan derbasdar e. Ez bixwe pir baldar im û bê maske tu carî naşixulim. Pir caran jî bi du maskeyên cerrahî, tibî ez li nexweşan dinêrim. Ez mesafeyê diparêzim. Sîstema laşê xwe xurt û hêzdar dikim. Ez nahêlim ez qelew bibim lê li xwarin û vexwarina xwe jî miqate me. Spor û egzersîz di jîyana min de heye. Ji xeynî sporê, rojê herî kêm 10 hezar gavî dimeşim. Xweza qedexe be jî li mala xwe, li cîyê xwe ez gavên xwe davêjim. Hewil didim bi şev 7-8 saetan razêm. Têr avê vedixim û ji stresê dûr im. Li paqijîyê miqate me, destên xwe nabim ser rûyê xwe. Baş e ku parza (aşî) hat û min xwe aşî jî kir.

**Em kurd ji maç û mûçan pir hez dikin. Em kurd pir nêzî hev û mirovên xwîngerm in. Di vê koronayê de me berîya maç û mûçan û me berîya nêzîkbûnê kirîye. Tu dikarî çi şîretan li me bikî?**

Bi rastî korona pir tişt li bin guhê hev xist. Ji alîyê çandî tiştin guherand. Lê ez bawer im em ê wekî berê nebe jî dîsa li wan rojan vegerin. Kesên bi hev re dijîn û hevalên ev ên taybet in ji xwe dikarin jîyana xwe berdewam bikin. Lê bi taybetî jî ji bo mezin û temendirêjên me divê em li vê miqate bin. Ez ji vê gotina pêşîyan jî pir hez dikim ; "Piştî tengîyê firehî tê." Em ê rojên xweş bibînin.

**Metabolîzmeyek baş dikare rê li ber hemû nexweşîyan bigre? Ji bo metabolîzmayek baş divê meriv çi bike?**

Na, mixabin ji bo rêgirtina li nexweşîyan metabolîzma tenê ne bes e. Tiştên din jî hewce ye lê cîyekî girîng ê metabolîzmayê heye. Divê mirov bê stres be, li xwarin vexwarina xwe miqate be, sporê bike û hwd.

**Mirovên li bajar û metropolan dijî wextê wan kêm e. Ji ber vê yekê xwarina xwe li derve dixwin û bi piranî xwarina wan Fast Food e. Meseleya xwarinê li ser tenduristîya mirovan rewşek çawa dilîze? Mirovên li bajar û metorpolan dikarin çi bikin?**





Ji bo metropolên mezin ev pirsgirêkek mezin e bi rastî. Lê bi ya min mirov vê yekê çi qas bikaribe kêm bike ew qas baş e. Li cihên ku bawerîya mirov bi paqijî û başîya xwarinên wan nayê divê xwarin neyê xwarin. Heta ji wan hat jî bila xwarinên malê û yên tê kelandin bêtir bixwin. Yanê Fast Food ne bi tendurist e. Ez bixwe ji kêfî nebe salê mehê carekê jî xwarinên Fast Food naxwim. Xwarinên gelerî û bi şênahîyan xemilî bêtir bala min dikişînin û wisa jî pêşnîyar dikim. Ev cûre xwarin hê bi tendurist in. Lê dîsa jî heta ji wan hat bila mirov li mala xwe xwarina xwe çêbikin û bixwin.

**Mirovên berê kêm diçûn nexweşaxaneyan û têra xwe jî emir dikirin. Lê em nifşên niha pir diçin nexweşaxaneyan û pir leqayî nexweşîyan tên. Mirovên berê çima hewqasî saxlem bûn û em çima hewqasî qels in? Meriv vê yekê tenê bi jîyana xwezayî ve girê bide rast e gelo?**

Na, ne rast e. Pir faktor û tiştên din hene. Berê kul û derd kêmtir bûn. Jîyan hê asayî û xweş bû. Mirovan qîma xwe bi tiştan biçûk dianîn û jîyanek ji rêzê besî wan bûn. Mirov pir kar dikirin û qelew nedibûn. Teknolojî û dîjîtal tune bû. Mirov zêde bi stresê re rû bi rû nedima. Xweza û mirov hevdu dihebandin. Berê doktor û nexweşxane kêm bûn û hin nexweşî bêyî ku bêne teşxîskirin mirov dikuştin lê dîsa jî wekî te gotî nexweşî kêmtir bûn. A niha her çi qas mirov xwe li tiştên xwezayî digirin jî xweza jî ne xwezaya berê ye. Derman û teknolojîyê genetîka axê û adanên xwezayî jî guherandîye.

**Dema extîyarên me nexweş dikevin bi koteki em wan dibin nexweşxaneyan. Extîyarên me naxwazin herin nexweşxaneyan. Em çawa dikarin wan qayîl bikin?**

Extîyarên me çavkanîya hebûna me ne li gora min. Çîrok, merselok, zûgotinok, bûyer, xebroşk…




di tûrikên wan de pir zêde ne. Çanda me ya devkî jî bi wan re li ser xwe dimîne û derbasî nifşê nû dibe. Divê em pir li ser wan bisekinin û têkilîya me ya bi wan re divê pir baş be. Zarok û yextîyar pir grîng in. Divê mirov zimanê wan ê têkilîyê bizanibe û wisa bi wan re bide û bistîne. Ew pir diltenik in, divê mirov hezkirinê li ser wan kêm neke. Bi vê paqijîya ji dil mirov nêzî wan bibe wê baştir bi ya me bikin û biçin nexweşxaneyan.

**Ji bo Hestû Tvyê tu bernameya "Sihet Xweş" bi rêve dibî. Ji bilî wê jî li ser Youtube, Instagram û Twitterê jî weşanan dikî. Siheta te xweş û te ji can û dil pîroz dikim. Li ser karê xwe tu pir dibetilî û bi ser de jî van karên pîroz dimeşînî. Tu vê hêza xwe ji çi digrî?**

Spas dikim, mala te ava be. Bi rastî ez niha hema hema di hemû platformên medyaya civakî de heme. Ji yên te gotî wêdetir Facebook û TîkTok jî li min zêde bûye. Wekî di serî de me got bi eşq û evîn ez li ser xwe me. Ne ji vê hezkirinê bûya min ê nikarîbûya ez van xebatan bikim. Bila şaş neyê êmkirin, ez naxwazin pesnê xwe vedim lê jixwe ez mirovekî jêhatî me. Ez xezeba xwe bera ser çi bidim divê ez di wî karî de bi ser bikevim. Piştevanî û alîkarîya şopînerên min ên ezîz jî hêzê dide min. Jê wêdetir jî ez bi axê ve girêdayî me. Ez ji axa xwe, dê û bavê xwe û ji kurdên xas sûdê werdigirim. Hem ez civaka xwe diparêzim, hem ji keç û xortên ciwan re dibim mînak û hem jî ez hewil didim taca serê Kurdîya delal bixemilînim. Hesteke pir xweş e bi rastî jî. Ma ka ez hê çi bixwazim? Tu derdekî min î ku ez şexsê xwe derxim pêş tune ye. Lê xebata min çi qas belav bibe ew qas baş e. Hem ji bo tenduristîya mirovan û hem jî ji bo termînolojîya tibê, tenduristîyê ez vê dixwazim. Wisa jî hêza min li ser xwe dimîne.



**Extîyarên me gava diçin nexweşxaneyan nikarin êşa xwe bînin ziman. Bijîşkê hemberî wan bi kurdî fam neke. Di nimura acîlê (112) de jî cih nedane zimanê kurdî. Extîyarên me ji vî derdî pir muzdarîp in. Çareserkirina vê meseleyê divê çawa be?**

Ez pir zêde nikarim vê pirsê veçirînim. Ji ber ku meseleyek gird û giran e. Hewceyî gotinê jî nake jixwe, divê her mirov bi zimanê xwe yê dayikê bikaribe bigihêje hemû xizmetan.

**Di demên berê û niha jî muzîk ji bo tenduristîya mirovan dihat bi kar anîn. Di rewşên wekî niha de (dewra koronayê) muzîk dikare rolek çawa bilîze?**

Te qala xalek pir xweş kir. Huner mirovan tedawî dike, ruhê mirovan aram dike. Hemû beşên hunerê wisa ne li gora min lê cîyekî din ê taybet ê muzîkê heye. Jixwe muzîk bi şano, sînema, govend û hwd. re jî heval e. Gihaştina muzîkê ya dilê mirovan hêsantir e. Muzîka ku kêfa mirov jê re tê ji mirov re pir baş e. Stresa mirov kêm dike û eşqa jîyanê lê zêde dike. Bi vê re jî mirov hê bi tendurist dibe. Muzîka Kurdî jî bi resenîya xwe û dewlemendîya xwe pir baş e. Divê em li hunermendên xwe yên muzîkê jî xwedî derkevin ku bêtir li hunera we germ bibin û tiştên nû biafirînin. Dengbêjî jî resenîyek me ya civakî ye, divê ev newayên kurdewar di kerika guhê her Kurdî de ji xwe re hêlînekê çêbike.

**Gelê me ji te û ji vîdeoyên te pir hez kir. Extîyarên me guhê xwe didin şîretên te. Ji bo pêşerojê xebatên te wê çi bin?**

Ez ji ber vê pir kêxweş im. Li gora dem û derfetên xwe ez ê tu carî nesekinim û çi ji min bê ez ê texsîr nekim. Ez ê siberojê pirtûkên tibê, tenduristîyê jî dîyarî xwendekar û xwînerên delal bikim. Nivîs wê her hebe di jîyana min de. Qada herî zêde dem digire û dijwar e nivîs e li gora min. Lê ya ku herî pir min kêxweş dike jî ew e. Bila mirov nivîsan bixwînin.

Bila tu nivîs sêwî nemîne û bê xwendin.
Ez ê li ser weşanên zindî yên youtubê bêtir hûr bibim, lewre qadek xweş e û înteraktîfbûna weşanên zindî tamek xweş dide xebatan. Ez ji tiştên ji xweberî diqewimin û ji pirsên cûda pir hez dikim. Lînkên youtubê li ser platormên din jî dikare bê belavkirin û ev yek ji bo gihaştina xebatê pir girîng e. Wekîdin jî pêşnîyarên televîzyonan hene lê ez niha ne zelal im ji bo bernameyên televîzyonê. Ez zêde lez jî nakim. Ez dixwazim gava min qut û qalin-stûr be, ne zirav û dirêj. Bi hêvîya rojên xweş, ji bo her kesî aramî û tenduristîyê dixwazim.

***Ji bo şopandin û têkilîyê:***

*Twitter: https://twitter.com/dresercetin*

*Youtube: https://twitter.com/dresercetin*

*Instagram: https://www.instagram.com/dresercetin/*

*Tiktok: https://vm.tiktok.com/ZSoArKrR/*

***Facebook:***

*1. https://www.facebook.com/tenduristiyabiKurdi/*

*2. https://www.facebook.com/eser.cetin.52*

# RÊBAZA FÊRKIRINÊ YA XANIMA MARIA MONTESSORÎ

Mustafa Rêzan



Fêrkirin, beşa perwerdeyê ya bi plan û bername ji pêşdibistanê destpê dike û heya lîsansa bilind e. Di fêrkirinê de bi plan û bername perwerdebûn an jibergirtina mufredata diyar pir girîng e. Ev pêvajoya perwerdeyê ji teref pispor û zanayên heman beşê dihên pêşkêşkirin. Ev perwerdeya bi rê û rêbaz ya ji pêşdibistan û heya zanîngehê dajo, di heman demê de pisporiyê dide meriv û meriv ev agahiyan di jiyana xwe ya rojane yan perwerdehiyê de bikar dihîne. Ji pisporên fêrkirinê yek jî Xanima Maria Montessorî ye.

Yekem diktorê jin a Îtaliyayê Perwerdekar Maria Montessorî, sepandina xwe ya yekem a bijîşkî li ser psîkiyatriyê kiriye. Paşê bala wê kêşaye ser perwerdehiyê û beşdarî waneyên perwerdehiyê(pedagojiyê) bûye. Li ser rê û rêbazên perwerdehiyê lêkolîn kir û xebatên wê, ew dagerandin li ser rêbazên guncaw yên perwerdekirina zarokên nekanyar(astengdar). Û Xanima Maria Montessorî, pirsa vê mijarê re têkildar bû. Xanima Maria Montessorî, ji bo bibîne ku kîjan rêbaz baştirîn encamê dide, bi awayeke zanyarî bi ser vê mijarê de çû û ceribandinan kir. Gelek zarok bi awayeke ber biçav pêş de çûn û bersiva rêbazê stend.



Di 1907an de Xanima Maria Montessorî li herêmeke xizan a Romayê li San Lorenzoyê, navendeke roja tam a nêrîna zarokan vekir. Di wê demê digel ku malbatan ev zarokên xwe yên nekanyar dernedixistin derveyê û ev zarok bi tena serê xwe li rûbirûyê sextiya nekanyariyê(astengdariyê) diman, vekirina navendeke wusa, navtêdaneke gelek mezin bû. Û ev navend li welêt bû yekem mala zarokan, bi zimanê Îtalkî Casa dei Banbini.

Zarok, pêşî reftarên acisiyê nîşan dan. Paşê biçalakiyên xaçepirsan, bi amadekirina xwarinan, bala wan kişiya ser alav û materyalên Xanima maria Montessorî. Zarok xwe bi xwe derbasî pêvajoya perwerdehiyê bûn. Û ev yek li ber çavê xanima Maria Montessorî jî ket. Maria Montessorî, bi bikaranîna rabirdû, zanîn û nêrîna zarokan, xwast ku zarok xwe alavên perwerdehiyê hilbijêrin û tevlî pêvajoya perwerdehiyê bibin. Û xwast ku zarok, xwe bi xwe kanîn û potansiyela xwe derxin holê.Bê guman Xanima maria Montessorî, di vê xwesteka xwe de jî ser ket. Di sala 1910an de ev xebatên Xanima Maria Montessorî bala civakê, çapemenî û pisporên perwerdehiyê kêşa û dibistanê wê, li seranserê Avrûpayê belav bû. Û di sala 1911an de bi vekirina dibistana li Tarrytownê ya li Neteweyên Yekbûyî ya Emerîkî, li seranserê cîhanê, rêbaza Xanima maria Montessorî belav bû.

**Rêbaza Xanima Maria Montessorî li ser van xalan radiweste;**

- Divê zarok xwe bi xwe lêkolîn û ceribandinan bike û di encamê xeletiyan bike, lê ji bo serastkirina xeletiyan divê firsend were dayîn.
- Li gor vê rêbazê her zarok, xwedan kesayetiyek e û di bijartinê de azad e. Û divê berpirsiyariya vê azadiyê ragire.
- Ji bo zarok azad bibe, di qada perwerdehiyê de sererastkirin dihê kirin û li gor vê, alav û peratl dihên amadekirin.





- Divê berpirsiyariya bijarin, diyarkirina dem û dû çalakiyê berhevkirina alavan ragire ser xwe.
- Malbat û mamoste di vê pêvajoyê de tenê rêberên lawaz in. Di vê pêvajoyê de armanc ne rêliberxistin e, armanc pêşkêşkirina alavên guncaw û destekbûna zarok e.
- Rêzdariya li zarok bingeh e. Heger rêzdarî li biryarên wê/î were dayîn, dê kanîn û potansiyela heyî xweştir derkeve holê.
- Xanima Maria Montessorî dibê; "baldariya we ya li zarok, ne bi hînkirina tiştekî li wê/î, divê bi armanca vêketina ew çîrûska li hundirê be."

Rêbaza Xanima maria Montessorî, rêbazeke bi navendzarok e. Ango di navenda pêvajoya perwerdeyê de zarok heye û perwerdehî li gor şêweya hînkirina zarok, li gor hewcehî û kanyariya zarok e. Li gor vê rêbazê, zarok tev bi heman şêweyê fêr nabin û divê li gor her kesayetiyê her pêvajoyekek taybet were sazkirin. Di vê rêbazê de hesta meraqkirinê zindî dihê hiştin û zarok li dû vê hestê dihere. Her wuha di vê mijarê de bar dikeve ser milê mamoste û divê mamoste, hesta wan a meraqkirinê zindî bihêle. Rêbaza Xanima Maria Montessorî tenê li ser puan û dersan nasekine. Her wuha li ser pêşveçûna kesayetî û civakî ya van zarokan jî disekine. Kesên bi vê rêbazê dihên perwerdekirin, di seranserê jiyana xwe de gelemper, pirsgirêkan çareser dikin, xwedan ruhekî tîmî û nûjen in. Li derdor û ji hev re bi awayeke rêzdarî tevdigerin û li gor hêz û nekanyariya xwe dixebitin.



Navenda Perwerdeya bi rêbaza Xanima Maria Montessorî, li gor pêşveçûna zarok dihê sererastkirin. Dolav an cihên pertalên xwe dixinê, li gor qama zarokan dihê amamdekirin. Ango dolav û cihên pêwist ne pir bilind in. Her tişt li hola navenda perwerdeyê bi awayeke rêkûpêk, asan, serast û dîtinê te dîmeneke xweş dide zarokan, da ku bala zarokan bikêşe û zarok bi meraqdar li zanînê gavan bavêje. Mase û kursiyên wan li gor xebatên tenê û tîmî bi awayeke bikarhêner dihên amadekirin. Her wuha ji ber ku zarok bi xebata xwe li zanînê digerin, ji bo ku zirarê nedin xwe goşeyên her alav û pertalî, dihê giloverkirin. Her zarok dû xebata xwe ya bi tenê yan dû yê bi hevalên xwe re, pertalên xwe radihêjê û dike ciyê wî/wan. Di encamê derdor, ji bo kifşkirina zarok, ji bo tevgera wan a azad dihê amadekirin.

Polên rêbaza Maria Montessorî, zarokên ji aliyê ji yê ve sê salan cudahî navbera wan de heye, dihîne bal hev. Zarokên ji saliyê biçûk, zarokên navbera sê û şeş salan û zarokên navbera şeş û neh salan. Di encamê de sê polên taybet amade dike. Bi şêweya hînkirina xwebixwe  ya tenê û ya bi komî ev her sê pol dihê rêvebirin bi çavdêriya mamosteyan.

Li gor rêbaza Xanima Maria Montessorî zarok ji jidêbûnê heya şeş saliya bi hişê mêjandinê; hînî derdorê, ziman, kevneşopî û çandê dibe. Di asteke din a dahatû de ango ji şeş saliyê heya duwanzdeh salan, zarok xwedan hişekî rasteqîn e û bi bikaranîna xeyal û ramanên razber dikare c îhanê fêm bike. Di asta sêyem a navbera duwanzdeh û hîjdeh salan de jî xort, xwedan hişekî alîkariya mirovahî û civakî ye. Di asta dawiyê ango di navbera salên hîjdeh û bîstûçaran de jî êdî wekî pisporekî dikare cîhanê kifş bike.







**Hêlên xurt ên vê rêbazê**

Rêbaza Xanima Maria Montessorî ya fêrbûna xwebixwe ji gelek hêlan ve zarokan pêş de dixe. Ev rêbaz bi komxebata zarokên ji aliyê jiyê ve ji hev cuda pêşveçûna civakî û têkiliyeke xurt derdixe holê. Bi tevlêbûna salan zarok ji hev bêtir fêm dikin û mezinbûneke dûrî rêzê derdixe holê. Zarok bi awayeke xwebixwe fêrkirina xwe birêve dibe û ev azadî û lihevanîna zanînê, bandoriyeke mezin li dahatûya wî/ê jî dike. Ew meraq an dozînendekirina ji hundirîn a ji ber pêvajoya perwerdeyê, zarok dixwaze bgihêje zanînê û ji bo vê yekê dixebite û di encamê hewcehiyên xwe yên kesane û civakî pêk dihîne.

**Hêlên sist ên vê rêbazê**

Bêguman nayê vê wateyê ku her rêbaz yekser serkeftî yan binketî ye. Her wuha her hêlên rêbazan ên xurt û sist hene.  Ev rêbaz, dibe ku pir buha be ji bo hin herêman an malbatan. Û ji ber vê yekê bi temamî neye pêkanîn bi rêzik û qaîdeyên xwe. Ev jî dê bibe sedema perwerdeyeke lawaz û di encamê de neserketin ji bo xwendevan. Ev rêbaz, ji bo hin zarokan dibe ku pir sist be û nabe ku zarok werin kontrolkirin. Ango serbestbûna zarokan ne her tişt e. Ji bo pêşveçûna bi lezgîn a xwendevan, hinekî bi mamoste û asîstanan ve jî girêdayî ye. Heger mamoste, vê perwerdeyê ji dûrî ve temaşe bike û bi awayekek rêkûpêk tevlî pêvajoyê nebe, bêguman dê perwerdehî bi ser nekeve.

**Çavkanî**
https://www.leportschools.com/blog/five-montessori-secrets-literacy/
https://amshq.org/About-Montessori/History-of-Montessori/Who-Was-Maria-Montessori
https://www.fundacionmontessori.org/the-montessori-method.htm
https://www.rasmussen.edu/degrees/education/blog/pros_cons_montessori_education/
http://ageofmontessori.org/differences-montessori-traditional-education/

# PIŞTÎ VEGIRTINA KORONAVÎRUSÊ REWŞA TENDURISTÎYA LAŞ

FZT. MUSTAFA ÖNAL
FÎZYOTERAPÎ Û REHABÎLÎTASYON

Koronavîrus an jî covîd-19, di sala 2019an û vir da bandorê li ser mirovan dike. Mirovên vê vîrusê vedigirin dikevin rewşeke çawa?


Piştî nexweşîyê mirov ji alîyê laşî (bedenî, fizîkî) ve bi kîjan pirsgirêkan re rû bi rû dimînin?

Mirov dikarin çawa xwe ji bandorên giran ên koronayê biparêzin?

Em ê li ser bersivên van pirsan rawestin lê berî ku em derbasbin mijara xwe divê em di derbarê koronavîrusê da çend agahîyan hîn bibin ku em bizanibin em ê çawa bergirîyan bigirin.



Koronavîrus, li gor zanyarîyên heyî, cara yekem di sala 2019an da li eyaleta Wuhanê ya welatê Çînê derketîye û li tevahîya cîhanê belav bûye. Ji ber ku êşeke berbelav e wekî pandemîya covîd-19 hatîye bi nav kirin. Pandemî, ji êş û nexweşîyên berbelav ên ku li gelek deran derdikevin re tê gotin.




Xebatên ji bo dîtina derzîyê (parzayê) û dermanan gihîştine qonaxeke mezin û mirovahî ji van xebatan êdî bi hêvî ne. Ji bo parastina ji koronavîrusê divê mirov çend tiştan bi baldarî pêk bînin: "Dûrahî, rûdank(rûpoş), paqijî". Divê di navbera mirovan da herî kêm 1,5-2 m. hebe. Herwiha bikaranîna rûdankê jî pir girîng e. Divê mirov destên xwe nedin poz, dev, çav û rûyên xwe û destên xwe herî kêm 20 çirkeyan bi av û sabûnê bişon.

Em werin ser mijara xwe. Kesên koronavîrusê vedigirin li nexweşxaneyan bên razandin jî, li malê di bin çavdêrîyê da bin jî; ji ber bandorên koronavîrusê bêtevger dimînin. Herwiha kesên di karantînayê da yan jî ji ber qedexeyan nikaribin derkevin derve jî li malê an radizên, an li fîlman dinêrin an jî dema xwe bi telefon, kompîtur, xwendin, xwarin û vexwarinê derbas dikin. Di van hemû qonaxan da heke mirov ji cîyên xwe nelivin, egzersîzan nekin, li malê nemeşin û hwd. piştî demekê wê gelek nexweşî û pirsgirêk derkevin.

Qelewî (obezîte), êşa masûlke û hestîyan, werm, pirsgirêkên wekî piştxwarî (skolyoz) û piştxûzî (kîfoz), êşa movikan hinek ji van pirsgirêkan in.

Bingeha pirsgirêkên laşî, bêtevgerî û tevgerên çewt in. Tevger, ji bo berdewamîya jîyanê çalakîyên girîng in. Çi ne ev çalakî?: "Tevlivîn, zivirîn, lerizîn (cirifîn, ricifîn), meş, bazdan, avjenî..."




Tevger, bi gelemperî, bi hevkarîya masûlke û hestîyan pêk tê. Bi tevgerê re xwîn, gera xwe ya laşî didomîne. Ev jî tê wateya berdewamîya jîyanê.

Di laşê mirovên gihîştî da kêmzêde 206 hestî û 300 cot masûlke hene. Bêtevgerî, herî zêde dibe sedema nexweşî û pirsgirêkên masûlke û hestîyan. Bi taybetî jî xetereya li ser hestîyê piştê pir zêde ye: "Fitq, êş, qerimîna masûlkeyan, asêbûn û eciqîna rehikan û hwd."

Bêtevgerî, dibe sedema gelek pirsgirêkan. Herwiha gelek pirsgirêkên heyî jî ji ber bêtevgerîyê giran dibin. Em dikarin hinek pirsgirêkan wisa rêz bikin:


**Artrît (Arthritis)**

Kulbûna movikan, movikkulî. Tevger bi hevkarîya masûlke û hestîyan ji movikan pêk tê. Bêtevgerî dibe sedema êş û kulbûna movikan.



### Qelewîya Zêde – Obezîte

Dema mirov bêtevger bimînin, zêde zêde xwarinê bixwin hêdî hêdî di laşên wan da rûn berhev dibe û qelew dibin. Dema ev qelewî bigihêje qonaxeke xeternak wekî obezîte tê bi nav kirin.



### Osteoporoz


Osteoporoz, ji bo helîna hestîyan tê bi kar anîn. Di vê nexweşîyê da girseya hestîyan kêm dibe. Şikestina hestîyan pir hêsan dibe. Divê ev nexweşî timî di bin çavdêrîyê da be. Derman û fîzyoterapî bi hev re bên bi kar anîn bandorên osteoporozê kêm dibin.




Masûlke û hestîyên mirovên bêtevger, piştî demekê lawaz dibin û şikestina hestîyan pir hêsan dibe. Bi tevgerê re girseya hestîyan zêde dibe û hestî xurt dibin.

### Osteoartrît

Gel, ji vê nexweşîyê re dibêjin "kirêcgirtin". Bi taybetî jî li çongê/çokê xuya dibe. Osteoartrît, bi hilweşandina kerîneke (cartilage) re kulbûna movik û hestîyan e. Di navbera hestîyan da kalsîyûm kom dibe, ji ber vê sedemê wekî (kirêcgirtinê/kilsgirtinê) jî tê bi nav kirin (kalsîfîkasyon).





## Romatoîd Artrît

Romatoîd artrît, nexweşîyeke bi kulbûnê dest pê dike. Ev nexweşî domdar e û sedemên wê nayên zanîn. Herî zêde bandorê li movikan dike lê di hinav û gelek lebatên mirov da jî dibe sedema kulbûnê.

Romatoîd artrît, herî zêde bandorê li movikan dike. Movikên tilîyên dest û nigan/lingan, enîşk, mil, çong/çok û hwd. Bi gelemperî bandora li ser movikan dualî ye. Movika alîyê çepê kul bûbe, bi giştî ya alîyê rastê jî kul dibe. Movikên bêtevger, zû kul dibin û rê li ber gelek nexweşîyan vedikin.



Piştxwarî (skolyoz), piştxûzî (kîfoz), fitq, felc, hîpertansîyon, xetimîna rehên xwînê, qelewbûn û gelek pirsgirêkên din rasterast bi tevgerê re têkildar in.

**Mirov wê çawa laşê xwe ji xetereyan biparêzin?**

Laşê mirov, bi hemû lebat û pergalên xwe bêhempa ye. Mejî ferman dide; dil diavêje, çav dibîne, guh dibihîze, çerm hest dike, rehik (rîşe) hişyarîyê didin masûlkeyan û tevger pêk tê û hwd. Ji bo ev ahengî û lihevkirin hilneweşe pêdivî bi laşekî tendurist heye. Çi di dema xebatê çi di dema razanê çi di dema bêhnvedanê da divê mirov bala xwe bidin tenduristîya laşên xwe.

Me di serî da gotibû hinek kes ji ber koronayê li nexweşxaneyan tên razandin. Ev nexweşana piştî koronayê derbas dikin an wan derbasî servîsên din dikin an jî wan dişînin malê. Di serdema nexweşîyê da ev nexweş bêtevger mane. Gelek ji wan di danûstandina hilmê da pirsgirêkan dijîn. Hinek ji ber bêtevgerîyê bi êş û nexweşîyên hestî, masûlke, movikan re rû bi rû dimînin. Lawaz dibin. Li hemberî nexweşîyan qels dibin.


Bi kurtasî divê piştî koronayê ev nexweş bên parastin û ji bo jiholêrakirina bandorên bêtevgerîyê bernameyeke têr û tije bê sepandin. Bijîşk, fîzyoterapîst, derûnnas, terapîst, malbat divê bi awayekî hevbeş li ser pirsgirêkan rawestin


Gelek mirov jî bandorên koronayê najîn lê di karantînayê da dimînin. Gelek mirovên tendurist jî ji ber qedexeyan an jî ji bo parastina xwe ji malê dernakevin.


**Mirov çawa dikarin li malê, xwe jî encamên bêtevgerîyê û tevgerên çewt biparêzin?**

**Bikaranîna Telefonê**

Di her kêlîya jîyana me da telefon êdî bûye pêdivîyek. Di bikaranîna telefonê da piranîya mirovan ser û stûyên xwe bi ber telefonê ve xwar dikin. Bi vî awayî giranîya li ser stû zêde dibe û rewşa laşî dikeve xetereyê.
Divê mirov xwe bi ber telefonê ve xwar neke. Ya rast divê çav li hember bînêrin û em telefonê bînin rasta çavên xwe.








**Razan – Veketin – Raketin**
Balîfa rast, razana xweş. Divê em li gor vê rastîyê tevbigerin. Ji bo razaneke xweş û bêhnvedanê divê nivîn û balîfa mirov jî bi baldarî bên hilbijartin. Bêguman her mirov taybet e û hilbijartin jî divê li gor vê taybetîyê be lê divê balîf û nivîn ne zêde bilind bin ne jî nizm bin û ne zêde nerm bin ne jî hişk bin. Dema mirov serê xwe datînin ser balîfê pêwîst e stû bi ber jor û jêr ve xwar nebe û hestîyê piştê bê parastin.





**Rakirina Giranîyê**

Giranîya zêde bandorên giran li ser tenduristîyê dihêle. Divê giranî bi baldarî û bi zanebûn bê hilgirtin û herwiha giranî divê li gor hêza mirov be.

**Rûniştin**

Rûniştin, di jîyana mirov da çalakîyeke berbelav e. Çi di dema xebatê çi di dema bêhnvedanê da em gelek caran rûdinên. Ji bo ku ev rûniştin di şûna bêhna me bîne ber me, mala me xera neke berî her tiştî pêdivî bi rûniştekên tehdeyê li dûvik, qorik u piştê nekin heye. Divê em di dema rûniştinê da pişta xwe rast bikin, nigên (lingên) xwe bidin erdê.




Koronavîrus bandora herî mezin li pişikê (kezeb) dike. Bêhna mirovan teng dike. Mirov nikarin bi hêsanî hilmê bidin û bistînin. Bi kurtasî astengîya herî mezin danûstandina hilmê ye.

Pirsgirêkên hilmê piştî koronayê jî didomin. Ji ber vê fîzyoterapî û rehabîîtasyon pir girîng e. Divê bernameyên ji çalakî û egzersîzên hilmê pêk tê ji alîyê fîzyoterapîstan ve ji bo nexweşan bên amade kirin. Bi rêya rehabîlîtasyonê piştî koronayê encamên giran dadikevin asta herî jêr. Egzersîz, rêbazeke taybet e. Divê ji alîyê fîzyoterapîstan ve bên amade kirin û sepandin. Piştî nirxandina rewşa nexweşan, li gor pêdivîyên nexweşan bernameya egzersîzan tê amade kirin.

Li gor înternet û çavkanîyên biguman tevnegerin. Ji pisporan alîkarîyê bixwazin.

HEMÛ BERHEM



Çil salan de, di zik hev de salê kitêbeke min derketiye!

FİRAT CEWERÎ:

# EZ HÊ JÎ BI KELECANA ÇIL SAL BERÊ DI VÊ RIYÊ DE DIMEŞIM




Kovara Çandname: Birêz Firat Cewerî, sala 2020an çilsaliya nivîskariya te bû, pîroz be! Bi vê minasebetê, em dixwazin tu hinekî vegerî salên bihurî û ji me re behsa rêwîtiya xwe bikî...

**Firat Cewerî**: Pir spas! Min hertim gotiye û dîsa dibêjim; ez bi salên xwe ên pir ciwan ketim nav siyasetê û pir zû jî jê derketim.Di dawiya salên heftêyan de me di siyasetê de hem xebatên pratîk dikirin, hem jî ên teorîk. Me belavok belav dikirin, li ser dîwaran slogan dinivîsandin û li gund û bajaran propogandaya siyasî dikir.Ji aliyê din ve jî, me pir kitêb dixwendin. Ji bilî kitêbên siyasî ên ku me bi xwe dixwendin, me hin kitêb jî bi dorê dixwendin û me bi komî li ser sohbet û minaqeşe dikir.

Em xort bûn, bi zimanê xelkê, em telebe bûn. Me ê gel şiyar bikira û bi pêşengiya çîna karker şoreşek li dar bixista. Me di hundirê du-sê salan de bi têra 10-15 salan kitêb xwendin. Xwendina kitêban hem baweriya me xurttir dikir, hem jî em bi rêxistinên din re dihatin hemberî hev ûem diketin minaqeşeyên kûr. Em wek avê li felsefe û dîyalektîkê diçûn û di rengê aliman de diketin analîza îdeolojiyan. Em bi xwe bawer bûn, me gotinên qelew dikirin û em ji emrê xwe mezintir dipeyivîn.

Me di wan salan de li bajarê xwe komeleyek vekiribû û ez wek serokê komelê hatibûmhilbijartin. Êdî gotina dawî li ba min diqediya. Lê ez bi nexweşiya nivîskariyê jî ketibûm.

Digel kitêbên siyasî, min zor dabû xwendina kitêbên edebî jî. Min bi tirkî dixwend û bi kurdî dinivîsand. Min ji xwe re defterek peyda kiribû û ew deftera xwe tije gotinên qedexe kiribû. Cihê veşartina wê deftera min jî paxila rebena diya min bû. Gava eskeran ji xafil de digirtin ser malê, an jî ser taxê, min hema ew defterka xwe divirvirand ser diya xwe û wê jî tavilê radihiştê û ew di paxila xwe de vedişart...



Gava dengê teperepa postalên eskeran hat û me hê jî şoreş li dar nexistibû, ez êdî ketim gumanan. Temenê min gihiştibû 18an, lê min digot belkî ez 80salî me.




Ez rojekê bi hevalên xwe, ên ku çend salan ji min mezintir bûn û ji min hinekî xwendetir bûn re ketim minaqeşeya dîktatoriya proleteryayê. Min nerazîbûna xwe ya li dijî dîktatoriya proleteryayê anî zimên û ez li dijî desthilatdariya yekpartîtiyê derketim. Fikreke weha hingî nedihat qebûlkirin. Hingî sîstema Sovyetê hebû, li gora bawermendên Sovyetê, Sovyet ji sosyalîzmê ber bi civaka komunîzmê ve ketibû rê. Em hemû bi awayekî mirîd bûn.


Hin ên Sovyetê, hin ên Çînê, hin jî ên Arnawidê bûn. Yanî hin Stalînîst, hin Maoîst, hin jî alîgirên Enwer Xoce bûn. Lê ez li xwe vegeriyabûm.

Ez ketibûm cîhana edebiyatê û bi girîngiya zimanê kurdî hesiyabûm. Min şev û roj li xwe kiribûn yek û ha ha dinivîsand. Gava ez têgihiştim ku ewrekî reş dike bi ser welêt de bigire, ez li riyên derketina derveyî welêt geriyam. Min di gulana 1980 de terka welêt kir û di îlona 1980 de jî cûntaya leşkerî bi xezeb hat ser hukum.

Ez hê jî xort bûm. Gava ez niha li wan rojan û li wî temenî difikirim, ez karim pir bi hêsanî bibêjim ku ez xortik bûm. Hê rih û simbêlên min baş derneketibûn. Lê dilê min ji bo avakirin û geşkirina ziman û edebiyata me çargopal lêdixist. Ji wê rojê de, yanî ji sala 1980 û bi vir de ez neketime nav tu partî û rêxistinên siyasî.

Min siyaseta partîtiyê nekiriye, lê min tu carî li dijî tu partî û rêxistineke kurdan nenivîsandiye. Ez hertim li gel diyalogê bûme û bêyî ez ferqeke îdeolojîk têxim navbera partî û rêxistinên kurdan, di warê kulturî û edebî de deriyê min heta dawiyê ji hemûyan re vekirî bûye. Ez beşdarî rojname, kovar, televizyon û radyoyên hemû beşên welêt û ên hemû partî û rêxistinên kurdan bûme û min ne fikrên wan, lê hertim fikrên xwe gotine. Min bi fikrên xwe,xwe nespartiye şelafiyê û tu carî nexwestiye tovê neyartiyê di navberapartiyên kurdan de bireşînim, berevajiyê wê, min hertim doza dostanî û xebata bi hev re kiriye.

Herweha ez li televizyon û çapemeniya tirkan jî bûme mêvan û li wir jî min hertim fikrên xwe gotine û di çavîkên televizyonên wan de min berê xwe daye desthilatdariya wan û li dijî zilma wan rabûme.




Ez li hemû tiştên ku min heta niha nivîsandine û di çavîkên televizyonan de gotine xwedî derdikevim. Ez ji ber xebat û kirinên xwe piştrast im. Navekî min hebe min bi xwe bi dest xistiye. Ên ku bi şelafiyê tên cihekî dikarin bi pehînekê ji wî cihî werin bidûrxistin. Baweriya mirov bi mirov hebe divê mirov kevirê giran be.




Ên ku xwe sivik dikin, çavên xwe digirin û devên xwe vedikin û êrîşî vir û wir dikin, piştî demekê poşman dibin. Ez bi xwe ji polemîkan hez nakim, polemîkan qet nakim. Bersivên rexne û êrîşan jî nadim. Her sal jî, wek soza sersalê, ên ku neyartiya min kirine û ez êşandime, ez wan efû dikim...

Bi efûkirina hev barekî giran ji ser milên mirov radibe û mirov xwe baştir his dike. Ji berdêla bihevdaketinê, mirov bi hev re gavan biavêje mirov ê zûtir bigihîje armanca xwe. Ji bo ez bigihîjim armanca me ev çil sal in ez di vê riyê de dimeşim. Di van çil salan de, kitêbên ku min nivîsandine û wergerandine jî hejmara wan çil e. Yanî, di çil salan de, di zik hev de salê kitêbeke min derketiye.Piştî çil salî, ez hê jî bi kelecana çil sal berê di vê riyê de dimeşim.Bi hêviya ku wê riya we jî her vekirî be...








QUDBETTÎN KERBORANÎ

# LÎSTIKÊN HERÊMA KERBORANÊ AN LÎSTIKÊN HERÊMA TORÊ

Lîstikan xaran lîstikeke di nav çanda kurdan de pir kevnar e. Di hiş û mejiyê her kurdekî de her dem jîndar e. Li hemû bajarên Kurdistanê lîstika sereke ye. Her zarê kurd miheqeq di emre de, di jiyana xwe de, wextekî xwe bi vê lîstikê borandiye û pê mijû bûye û pê lêyistiye. Tu ji kîjan mirovî bipirsî, ewê qala bîranîneke xwe ya vê lîstika meşhur û navdar, ji te re bike. Lîstikan ku belkî di nav civakê de herî hatî hezkirin lîstika xaran e. Xar, amûrine gilover in. Exleb ji şuşê hatine çêkirin. Yên ku ji kevir û hêsin jî çêbûne hene. Rengo rengo ne. Yên ku bi rengekî dagirtî jî hene û hene ku spî ne û navan wan bir rengê curbecur boyaxkirî ne.







**Lîstika xaran bi cend awayan tê lêyistin.**

**ŞAPIK:** Di serê pêşî de mirov, li ser erdê çember/hawêrekî xêz dike. Li ser xêza vê hawêrê xarên xwe datîne. Li miqabilî wê nêzî du metre dûr, rastexêzek tê xêz kirin. Her kes xaran xwe diavêje ser wê. Ya kê nêziktir be, ew pêşî despêdike. Li ser rastexêzê xaran xwe diavêje xarên li ser çembere. Çend heb xar jê derîne hemû dibin yên wî. Her kes li gorî merc û rêbazên lîstikê heya tu xar li ser xêza hawêrê nemînin, lîstik wuha dewam dike.

**HOLIK:** Di vir de jî, pêşî holikek tê kolandin. Li hemberî wê rastexêzek tê nivîsandin. Dîsa kî xara xwe nêzikî rastexêzê rawestîne, ew ewil xaran xwe diavêje holkê. Yên xara xwe êxisk xolkê de, xaran yên ku neketin holkê de û derveyî holkê mayin, yeko yeko wan bi xaran xwe tîne dixe holkê de. Lîstik bi vî şeklî dewam dike.

**BERDÎWARK:** Li gorî jimara ku xwediyê lîstikê levhatin, wulqas xaran deynin ber dîwarekî. Nêzî du metran jê dûr dikevin û bi xara di destê xwe de, ji xarên li ber dîwêr nîşan digirin. Ji xarên li ber dîwêr te kîjan nîşan girt û xara xwe lê da, ew xar dibe ya te. Heya xarên li ber dîwêr xilas dibin, lîstik bi awaya nîşangirtiye û lêxistine didome.

**SER:** Li ser rastexêzekî, li gorî levhatina kesan xar tên rêzkirin. Ji bo dora kesê pêşî diyar bibe, lîstikvan xara xwe diavêjin xêza ku nêzî du metran ji 'Serê' dûr e.



Kî xara xwe nêziktirin sekinand ew dora ewil bi dest dixe. Gava ku xara xwe biavêje Serê, ger bibêje; ` min ji ser û berê', ger wuha nebêje, gava kul i kîjan xarê da, ew tene dibe ya wî. Ger wusa bibêje, ku li Serê bixe, xar hemû dibin yên wî. Li xara li ber Serê bide, ji sere pê ve yên din hemû dibin yên wî. Çiqa ji xara nêzî Serê bide, ewqasî xaran zêhftir qezenc dike.

**ŞEL Û ŞEL Û BOST:** di qadeke berfireh de, tu xalekî ji xwe re kifş dike tu dibêje ; ` ez liv ir ` yên hemberî te jî wusa dibêje. Û li pey xarên hev dikevin. Heya yek, li xara yên din bixe. Gava ku li xara wî xist, ev xar dibe ya wî. Ev Şel e. Bi wî awayê jorîn eger tu ji xeyni lêxistin û nîşangirtina xarê, tu qay bostekî nêzî xara yê dijberî xwe bibe, dîsa xara wî dibe ya te. Ji wî awayê we re jî dibêjin; Şel û Bost. Lê di serê lîstikê de divê hûn biryara Şel an Şel û Bost bidin ku lîstik li gorî wan mercan bê lîstin.

**BERDAN:** ev cure di kaşikî ne zêhf bilind de, xaran di berdîn bi xwar de. Xara ku te berda, ji xarên jêrîn, li kîjanê bikeve ev xar dibe ya te. Heta xarên yekî biqedî an yê bibêje bes e, lîstik bi vî şeklî didome.

Çend cureyên lîstaka xaran din jî hene. Lê niha em bi pênasina vanan biqedînin danasina lîstika xaran. Eger Xweda destûrê bide me, emê di nivîsekê din de, bi danasina lîstikeke herêma Kerboran an Torê bi we re bin.
Bimînin di xêr û xweşiyê de.

**Ji bo alîkariya hevalên min,**

**midûr Siraç Akbulut, gelek spas.**

**Mala wan ava.**



FEWZIYÊ ENDEZYAR

# DAMEZIRANDIN A YEKEMÎN RADYOYA KURDÎ

Yekemin radyoya kurdî Radyoya Bexdayê di 29ê Rêbendana sala 1939an li Bexdayê her roj dane esrê dema ewil 15 deqiqayan bi Kurdî dest bi weşanê kir.

Dema weşanê di demên ewil de rojê 15 deqe bi Kurdî bû, pişre dema weşanê hate zêdekirin. Di sala 1946an bi Kurdî 2 saet û 45 deqîqe weşan dihat kirin.

Radyoya Bexdayê her çikas 16 sal beriya radyoya Erivanê dest bi weşanê kiriye jî ji ber desthilatdariya wê di destê Hikûmeta Bexdayê de bû mîna radyoya Erîvanê xurt nebûye.

Dewlet bi nêrînekê sîyasî radyoyê vekiribû û birêve dibir, politikaya radyoyê jî li gor rêzik û rêbazên dewletê bû.





Herçiqas radyo di destê rejimê de bû jî gelek stranbêjan di radyoyê de stranan gotine û gelek stranên Kurdî bi saya wê radyoyê hatine tomarkirin û gihîştine rojame.

Hunermendên wek Tahsîn Taha Berîvanê, Hesen Zirek bi strana Yella Şofêr, Eyşe Şan Xerîbim qêrîna xwe gihandineme, Îsa Berwarî bi klama Wey dinyayê, Mehemed Arifê Cizravî Zozaniyê, Meryemxan Wele domamê em ji wan awaz û gotinan bê par neman.

Radyoya Bexdayê her roj dane esre bi dengên dengbêj û stranbêjan di bûn mivanên malên me. Herwiha radyo bandorekê mezin li hunermedên ku bi radyoya Bexdayê mezin bûne jî kiriye. Radyo,çand û hunera kurdan, kurdên ku li Cîhanê belav bûne nedaye jibîrkirin.




MIHEMMED ÇAVKESK

# GELO JIBÎRKIRIN ÇI WEXTÎ DEST PÊ DIKE ?

Heta niha zanyar di wê baweriyê de bûn ku bi giştî ji temenê 55 saliyê û pê de jibîrkirin dest pê dike, lê lêkolîneke nû eşkere kir ku jibîrkirin di 30 saliyê de dest pê dike.

Di rapirsiyeke derbarê jibîrkirinê de, ji sedî 11ê beşdaran bersiv dane ku ew rastî derdê jibîrbûnê hatine, her ji temenê 40 saliyê ve. Ji sedî 6ê beşdaran jî bersiv dane ku di temenê 30 saliyê de kêşeya wan a jibîrkirinê hebûye.

Lêkolînê herwiha eşkere kir ku di ser temenê 50 saliyê de tirsa xelkê heye ku rastî jibîrkirinê bên û rastî şermezariyê bên ji ber jibîrkirina tiştekî girîng.







Ji wan tiştên ku zêde tên jibîrkirin, lixwenekirina goreyan e piştî derketina ji malê, yan jibîrkirina peyveke naskirî ye, yan carnan gava kesek li cihekî xwe dide naskirin, piştî demekê ji nû ve navê xwe bi bîra amadebûyan tîne.

Bûyerên jibîrçûnê gellek caran xwediyên xwe şermezar dikin û di wan de tiştên giring ji bîr dikin. Li gor lêkolînê ji sedî 92ê xelkê di ser temenê 50 saliyê de hewldidin bîrweriya xwe çalak bihêlin.

Jonathan Hancock ku mamosteyê perwerdeya jibîrnekirinê ye, dibêje:

"Bîrewerî tişteke ku tu dikî, ne tişteke ku milkê te be, mejî pêk hatiye ji şane û masûlkeyan, diguhere bi wî awayê ku mirov xwe hîn dike yan kar pê dike.

Herkes dikare mejiyê xwe perwerde bike û dikare jî encama wê bibîne ku çiqasî baş dibe."

Baştirîn hokarên ku mejî çalak dikin pêk tên ji şîrovekirina peyvên ji hevdu veqetandî, hevkarîkirina zarokan di şîrovekirina dersên wan de ku li dibistanê distînin. Herwiha pêkanîna heftane ya saet û nîvekê ya spora mejî dikare te ji jibîrkirinê biparêze.



# Çîrûskên Evînê

Rojbîn Ozkan

Di berbanga biharê de ji nû ve dawîya meha Adarê barîna Berfê zarokan mirovan gelek bextewar kiribû. Endamê malê giştî daketibûn ber derî bi berfê dileyistin.

Xweza weke keçek xama bûkanîya spî li xwe kiribû. Lê ne barîna berfê ne derd û kulen jîyanê, di rojeva Elîfê de tenê xortê çavkesk bû.

Xweza weke keçek xama bûkanîya spî li xwe kiribû

Erê xortê çavkesk! Wê ew nav lê kiribû ji ber ku hê navê wî jî nedizanî. Ew çend roj berê li markete pergî hev hatibûn.



Dema Elîfê turikên xwe girt destê xwe ber bi kasê çû ket rêzê ew jî gavek li peşîya wê de bû. berê xwe da Elîfê:

“Tu keremke turîkên min zêde ne li benda min nemine”.

Ev tevgera wî ya kubar gelek xweşê Elîfê çûbû. Lê ne tenê tevgerên wî, çavên wî ên kesk bişîrîna wî, porê wî ên direj her li ber çavê wê bû.

Elîf bi dengê zengila derî ji xayelên xwe dûr ket. Ê kul i derî xistîbû keçîka cîran bû:

“Bibore kekê min nexweş e. Gelo dibe ku tu werî serum pêde bikî?
“Baş e ser çava”

Elîf li nexweşxaneyek taybet de hemşire bû. Wê çû oda xwe cil û bergên xwe guherand û çû malîkê. Dema derî vebû. Ji boy Elîfê weke ku derîyê behişte vebe. Belê ne xeyal bû, ew bû. Xortê çavkesk li ber derî rawestîyabû. Dîsa wan çavên xwe ên kesk lê dinherî.

“Fermo! Hemşire Xanim dayika min li oda xwe de ye”

Elîf sê roj li pey hev ji boy ku derzîya cîranê xwe lê bixe çû malikê di heman demê de ew Kinyas êdî hevdû nas dikirin. Ew jî roj bi roj evîna xwe ya ku hê haya Kinyas pê tunebû, di dile xwe de mezin dikir...

Qasê du meh li ser hevnasîna wan borîbû rojek ew û kinyas li asansore pergî hev hatin. Kinyas pêşnîyara ku li derve bi hev re qehweyek wexwin kir. wê jî bi dilşadîyek mezin ew qebûl kir.

Ew roj hewa gelek xweş bû tav li ser asoyê welat diteyîsî. Xweza li benda baharê bû.

Elîfê fistanek reş li xwe kiribû. dismalek şînê asmanî dabû serê xwe. Tevê makyajek xwerû bi dile xwe yê hêvîberz çû pastxanê. Kinyas berê wê hatibû cihek li ber pacê rûniştin. Dile Elîfê weke çivîkek serjêkirî diperpitî. Kinyasjê pirsî bê ka ew çi vedixwe. Wê çîkoleteyek germ Kinyas jî Qehweyek wexwar.

"Li min bibore ezê çawa destpê bikim nizanim, lê ew demek dirêje ku min dixwast ez bi te re bipeyivim.


Kelecana Elîfê her ku diçû zêde dibû. Wê êdî sedî sed bawer dikir ku Kinyas jê re pêşnîyara zewacê bike.

Kinyas fincana di destê xwe de danî ser masê pala xwe da kursîyê desten xwe berhevkir:

"Zanî li kargeha me de endezyarek heye. Rastî ez dixwazim we bi hev bidim nasîn. Ka tu çi dibêjî?









Xeyalên Elîfê ji bînî ve hilweşîya bûn. wekî ku sîtîlek av sar li ser serê wê de rîjandi bin , di cihê de bistek şaş mayî li rûyê Kinyas nihêrî û paşê pirsî:

“Hevalê te?”

“Belê hevalê min Serdar. Tê bîra te carek em li hewşa apartmana me de pergî hev hatibûn me silav da hevdu hingê xortek li gel min bû? ew Serdar bû. Hingê wî te gelek ecêbandîbû. ji min re got ez dixwazim bi Elîfê re bipeyivim”

Serdar wê rojê pêşnîyara zewacê li Elîfê kir.

Elîf wekî zarokek pîlîstoka wî ji desten wî hatibe girtin hêvîşikestîbû.

Wê nedizanî çi bike. Tenê bi kubarî pêşnîyara Serdar bi şûn de vegerand û destura xwe ji wan xwest.Kinyas bi wê re heta ber derî hat dema Elîfê xatir jê xwest di dile xwe de axînek kûr kîşand û got;

“Oxir be evîna min”





PAŞA AMEDÎ

# “YA JI BO XWEDÊ MIN ZIKIR BIKIRA”

Demekê pirr berê şivaneke ciwan ji hevalê xwe re derdê xwe digot:

-Derdê min pirr giran e, heval. Ez ketime evîneke xedar û kûr. Heval:
-Tu evîndarê kê bûyî?
-Ez bûme evîndarê keça Padîşa
-Ev pirsgirêkeke mezin e. Li nêzê vê gundê derwêşek heye, em herin cem wî. Tê gotin ku dermanê her derdî li cem wî heye.

Dikevin rê. Derwêş di bin holikek kevin de dijiya. Derdê xwe jê re got. Derwêş:

"Mêze ke kurê min! Çareya vê derdê tenê yek e. Heya çel rojê divê ji Xwedê re zikir bikî. Pesnê Xwedê bikî.



## Şivan heya ku sax bû zikrê xwe dewam kir, bû ehlê Xweda

Piştî çel rojê wê padîşa were cem te wê serayê pêşniyarê te bike, qebûl neke. Wezirtiyê pêşniyarê te bike wî jî red bike. Paşê wê keça xwe pêşniyar te bike wê qebûl bikî. Tenê divê li ser vê çiyayê zikra xwe bikî."

Şivan bi hevalê xwe re çû ser wê çiyayê bi hêvîtiyek xweş û evîneki kûr; dest bi zikra xwe kir. Hefteya ewil jê re pirr bi dijwar hat lê paşê dielime. Ewqas xwe dabû zikrê ku di xewda jî tizbiya xwe dikişand. Di wê navberê de bîst roj derbas bibû.

Navê  şivîn li her derê belav dibe. Bi nav û deng dibe. Gelê gund û bajar tev pê dihesin. Navê wî digihîje Padîşa jî. Padîşa: "Em çawa bikin ku vî zilamî bînin serayê, bikin wezîr an wekî din...." Ku qala şivan dibe di wê gavê de derwêş xwe davêje pêş. Tu nabêjî derwêş aqilmendê padîşa bûye. Dibêje:





-Padîşahê min. Wê xwestinê we qebûl neke, yê baş keça xwe pêşniyar bikî.
-Weka ku em zanin ku welî be bê wî tu kes layîqê keça min nine

Piştî çel rojê padîşa û alîgirên xwe dikevin rê derin cem şivan. Padîşa xwestikên xwe pêşniyarê şivîn dike. Şivan tew pêşniyarên wî qebûl nake. Dawiyê padîşa:

-Eger tu layîq bibînî ez keça xwe bidim te.
-Evîna min di dilê min de ye, keça xwe bide yekî din. Padîşa û alîgirên xwe vedigerin serayê.

Derwêş paşê tê cem şivan, jê re:
-Te çi kir?
-Min ji bo keça padîşa zikir kir, padîşa keça xwe dida lê ku min ji bo Xwedê zikir bikira wê çi biba? Şivan heya ku sax bû zikrê xwe dewam kir, bû ehlê Xweda





# ŞÎROVEYA HELBESTÊ EHMEDÊ XANÎ

## YUSUF AGAH

"Ger te divêtin tu bibî mîr û ser û muteber
Kizb û xîlafî mebêj ger te bikin ker bi ker."
*Ehmedê Xanî*

Seydayê mezin Ehmedê Xanî di vî beyta xwe de xirapiya derewê aniye ziman. Seyda dibêje eger hûn bixwazin bibin miravekê mezin û mûteber, anku miravekê xwey rûmet û îtîbar, ji virr û derewan dûr bimînin. Belê em tev jî zanin ku derew, kar û amelekê pir qirêj, kirêt û bêqedr e. Gotinê herî xirap, derew e. Derew, hem li gor dînê me û dînên din hem jî li gor nirxên însanî û gerdûnî tiştekê neqenc e.

Derew ya mirov piçûk dike, li ber çavên Xaliq û xelqê tev ya mirov bêqedr dike.

Derew tiştekê wisa pîs e ku mirov carek jî derew bike, êdî xelq zû bi zû ji mirov bawer nakin. Qiseta "Şivanê Derewker" ez dibêm hema her kes li derekî xwendiye an jî seh kiriye (bîhîstiye). Lêbelê dîsa jî ez dixwazim bi kurtasî binivîsim;

"Dibêjin di demekî de li gundekî şivanek hebû. Lê adetekê pir nebaş yê vî şivanî hebû. Ewî zehf derewan dikir. Çend caran ewî kiribû gazî û hewar, gotibû "Hewaar hewar, gur ketiye nav keriyê, gelî gundiyan werin hewariyê..."



Lêbelê gava ku gundî hatibûn dîtibûn ku gur mur tine, şivan derew kiriye. Êdî wisa bibû ku kesî ji şivan bawer nedikira. Rojekî bira gur tê dikeve nav keriya pez û şivan diçe li gundiyan gazî û hewar dike lê kesek jê bawer nake û nayê telbê wî. Û gur ya keriyê telef dike."

Xwedê te'ala di Qur'anê de di zehf cîhan de dibêje ji derewê dûr bin. Pêxemberê me Hz. Muhammed jî (Silava Xwedê li ser Wî bî) di hedîsek de dibêjî; "Rast bin; Rastî (ya mirov) bi bal qenciyê ve, qencî jî bi bal cinetê ve dikişînî.

Ji derewê xwe biparêzin(ji derewê dûr bin); derew (ya mirov) dibe fucûrê, fucûr jî dibe cehnimê."

Dîsa gelek gotinên 'alim û zaneyan li ser vî mijarî hene lê ez naxwazim zêde dirêj bikim.

Ezê bi vî du'ayî nîvîsa xwe bidawî bikim; "Ya Rebbî! Tu zimanê me ji derewê û ya me jî ji derewkeran biparêze."

"Ya Rebbî! Tu zimanê me ji derewê û ya me jî ji derewkeran biparêze."





# KURDOPIYA ÎSLAMOPYA NÎNTOPYA

ZÎWER ÎLHAN

Bila ev welat bibe welatê hemû cîhanê. Hemû mirov bila hemwelatiyên wê bin. Bila herkes karibe bê wir û karibe ji wir biçe hemû welatên din. Kî were wir, qanûn û cezeyê Islamopyayê qebul dike. Ketin û derketina wî welatî bê peseport e. Lê kesê ku kete hûndir, kesekî din nikare wî/wê bi zorê ji vir derxe. Kurdopiya stargeha mazlûm, bêkes û belengazan e.

Mal û milk hemû yên Xwedê ne. Li wir herkes emanetkar e. Milk tên kirêkirin, madengeh û zîreetgeh tên îcarkirin, nayên firotin. Ji keda mirov pêve ti kes ti bahayî nastîne. Axa ku niha li ser tikesî netapokirî an jî axa xezînê bila nayê firotin, kî axê biçîne wê di destê wan de be. Ku sazûman Hte guhertin û Kurdopiya saz bû jî dewlet nikari mal û milkên hemwelatiyan ji wan bistîne. Lê yên ku kêrî xakê û cihê madenan neyên ew maf ji wan tê stendin. Mîras heye; lê di eslê xwe

de mal û milk dest diguhere. Yên ku mîrasxûrên wan nebin mal û milkê wan ji bo ku hemwelatiyên belengaz bêtir dewlemend bibin, li ser navê dewletê tê tomarkirin. Li wî welatê tine, keda mirovan pîroz e û dizî nayê efûkirin.

Li Kurdopya Îslamopyayê ceyran û hêz; bi hêza rojê, ba û cewherên din -ku zerarê nadin derdorê- tê çêkirin. Bac li ser berên petrolê (benzîn mazot) nîne û erzan in; lê desthilatdariya wî welatî hêzên alternatîf teşwîq dike. Li wir ti kargehên ku ava qirêj vala dikin çem û deryayan nînin. Çêkirina dexl, ber û tiştên ku ji rih û bedena mirovan re nebaş in qedexe ne. Azadiya daringên bizerar nîne.

Li Îslamopyayê, dînê dewletê adalet û liyaqat e.  Liyaqat, li Kurdopiya qanûneke bingeh e û yên ku payekê heq nekin û werin wê maqamê, wê ev rewş weke zilmê bê dîtin. Yên Misilman ji bedêla bacê, zikê didin, yên ne misilman cizyê didin. Bac ji karker û karmendan nayê stendin; lê ji yên ku kargehan dişixulînin û ji bazirganan wê bac bê stendin. Lewra bac an jî zike ji ser kara mirovan wê bê stendin.

Hemû karker û karmend ji aliyê xwediyê kargehan ve bi bahayekî bilind hatine sîxortekirin. Şîrketên sîxortayê ji ber vê û ji bo kara xwe wan kargehan hertim ji aliyê asayîş û tenduristiyê ve kontrol dikin. Sazûmana dewletê jî wan şîrketan kontrol dike.

Her endamê dînekî dikare li vî welatî li gorî dînê xwe bije; lê divê her endam an jî bawermend qanûn û rêzikên xwe eşkere bike. Her umet an jî xwedî dîn kî be; wê li gorî dînê xwe bije. Ku neheqî an dawe di navbera du mirovên dînê wan cuda de derkeve di mijarên gerdûnî (kuştina bi neheqî û bihemd, dizî, zina, xerabkirina nifş û sirûştê) de wê qanûnên Îslamî bên meşandin.Jiyanên ku nifşa mirovan dibirin, daringên ku zerarê didin hiş, rih û bedena mirovan qedexe ne. Li vî welatî qunekî û qundetî qedexe ye. Fahşitiya ku hemcins bi hev bikin qedexe ye û wê weke nexweşiyê bê dîtin. Bê nîqah ti kes nikare têkeve têkiliya zayendî. Ji bo dema pêşî wê hikumet qunek û qundeyan tedawî bike û wê wan têxe karekî din ku aboriya xwe bikin.

Hizmeta welat ya belaş ne tenê kirina leşkeriyê ye. Heta welat pir dewlemend bibe, jin û mêr heryêkê li gorî xwe belaş wê kar bikin. Di dema karkirinê de ji bo ku ew jî zilmê nebînin divê razan, xwarin û vexwarina wan ji kîsî dewletê be.

Artêşa Îslamopyayê ne ji bo dagirkirina welatekî din e. Ji bo aşitî, navcîtî, asayîş, gengeşe û xelaskirina mirovan herdem amade ye. Li kîjan welatên din ku hemwelatiyek wê, di bin zilm û zordariyê de be, bêdestûr diçe wan xelas dike.  Ji bo asayişa welêt, hêzên polîsî her dem amade ne. Leşker an polîsên ku ji bo berjewendiyên xwe, peywira xwe bikar bînin, ji kar têne avêtin.

Li Kurdopyayê, can, mal, milk û keda herkesî pîroz e. Li wî welatî, kuştina bi neheqî, zina, tecawûz, dizî, bertîl, qumar, fal, zilm û her çeşît neheqî qedexe ye û wê bê cezekirin. Ku mirovek belesebep û bi neheqî bêkuştin, ahlê mirovê kuştî dikarin ji dewletê bixwazin ku kujer bê kuştin an dikarin heqê xwînê bistînin an jî nestînin û tewanbaran efû bikin. Efûkirina tewanbaran ne di destê dewletê de ye, di destê xwedîheq de ye.



Di daweyên heqxwarinê de qazî divê pêşî wî heqî ji kedxwar bistîne. Lewra heps herdem ne çare ye. Şixulandina tewanbaran, ji bo zerara maxduran bingeh e.

Li wî welatî, dendik, sîsik û tuxmê bi GDO an jî yên ku hîbrît, nezayok, zerzoq bin qedexe ne. Ji xeynî lêkolînan ajal û riwekên ku zerarê didine herkesî û hertiştî -weke berazan- xwedîkirin û firotina ji bo xwarin vexwarinê qedexe ye.

Li Îslamopyayê, bêkarbûn û betaliya zêde nayê qebûlkirin.Dewlet,divê hemwelatiyan bike xwedî kar û hemwelatî jî li gorî xwe divê di karekî de bixebitin. Karker û karmend li gorî kar û xebata xwe, li gorî giringiya kar û zanebûna xwe meaş distînin. Ji bo ku dewlet di gelek karan de xizmetê dikre; karmend û karkerên dewletê hindik in.

Li Kurdopiya pere; bi zêr, zîv, bafûn, sifir hesin an jî bi madenên bêzerar û biqîmet tên çêkirin. Mirov, dikarin pereyên welatên din ku bi heman daringê hatibine çêkirin, pev biguherin. Pereyên kaxezî derbas nabin. Ji bo dema pêşî wê hikumet, perên kaxezî ji hemwelatiyan di bedêla zêr û zîvan de bistîne û bi wan pereyan ji derve zêr û zîvan bikire. Berdêliya mal û milkan serbest e. Riba (faîz- bizêdekirin) qedexe ye. Benqe dikare xwe bike şirîkê projeyan; lê nikare pereyan bifroşe an jî bi zêdekirin pereyan bide ti kesî. Benqe, wê bêzêdekirin deyn bidin hemwelatiyan. Li wî welatê ku li ser kedê ava bûye, borsa, bono, tahvil weke kefê têne dîtin û di aboriya wir de nayêne qebulkirin. Ti dewlet an şîrket ne pere ne tiştekî vî welatî -li derveyî wê jî be- nikarin li borseyan qîmet bidênê an qîmetê wê daxin. Hikumeta Nîntopyayê; ji bo ku peyase xerab nebe û enfilasyon nerabe, wê li gorî meha an serdeman behayê firaq, xwarin û her tiştî ya herî zêde eşkere bike. Êdî ti bezirgan, firoşker an dikandar; nikarin ji vê behayê bilindtir bifroşin. Ji bilî vê ji bo ku kedkar an cotkar jî zerarê nebînin wê dewlet ji bo her tiştî bahayê herîkêm eşkere bike. Ew welat hêviya kedkaran e. Di navbera cotkar, kedkar û kiryaran de ji sîmsarekî pêve kesî din nikare bixebite û ew sîmsar jî ji sedî

20an bêtir nikare kara xwe bavêje ser ber û dexlan.Yên ku ji bo malê firotinê xerab nebe depoyan çêbike jî weke sîmsar têqebûlkirin.

Li wî welatî pereyên gelek ji perwerdehiyê re ye. Perwerdeyî li ser baxtiyarî, parastin û teqwayê ava bûye. Xwendevan hînî fitratê dibin û agahiyên nelazim naelimin. Ezber qedexe ye. Hînkarî bi pirsiyariyê re dimeşe. Perwerdeyî li dibistanan tenê nabe. Kargeh, atolye û dikanên kar jî cihê perwerdehiyê ne. Hikumet bêtir qalîteya mamosteyan bilind dike. Çi ji xwendevanan re bivê, mamoste, wê hînî wan dikin. Meaşê herî bilind yê mamosteyan e. Perwerdeya herî biêş û zor jî ya mamosteyan e. Kesên bêsebir û ne eşqî xwendin nikarin bibin mamoste. Li kîjan heremê kîjan ziman bêtir bê axifandin, ew ziman zimanê fermî ye û perwerdeyî bi wî zimanî tê kirin. Lê herkes dikare hînî zimanê xwenî dayikê bibe. Eger ku li heremekê hejmara mirovên ku bi zimanekî din diaxifin ji sedî 10an bêtir be, ew ziman jî wê weke zimanê fermî bê qebulkirin.

Li wir, li wî welatê hêviyê; werzîşên ku zerarê didine mirovan û ajalan qedexe ne. Weke boksê, hevberdana ajalan, werzîşên bi kulman û bi pihînan xwînê ji bedenê tînin qedexe ne. Lê ji bo xwe parastinê mirov dikarin hînî werzîşên weke qerete bibin. Hikumet ji bo pêşbazî û olîmpiyatan pereyan nade. Yên bixwazin, wê bi derfetên xwe beşdarî pêşbazî û olîmpiyatan bibin. Hikumet wê bêtir bike ku hemwelatî derkevin siruştê, li gund û çiyayan alîkariya gundî û karkeran bikin. Ti kes nikare li hespan an pêşbirkan bi qumarê bilîze. Hîpodrûm, nînin.

Li Nîntopya, tenduristî belaş e. Ti textor nikare pereyan ji nexweşan bistîne. Textor bi meaşê dewletê xwe xwedî dikin. Dermanxane, dermanan belaş didine nexweşan û pereyên xwe ji dewletê distînin. Li wî welatî, antîbiyotîk ji navenda dermanan derketiye. Gîha û riwekên ku mirovan baş dikin di reçeta textoran de tên nivîsandin û li dermanxaneyan tên firotin. Ji heb, şirûb û riwekan, çiqas ji nexweşan re lazim be ewqas di pakêt û şûşeyên dermanan de hene. Textorên ku alî mafyaya organan dikin an li dijî tenduristiya mirovan û ajalan dixebitin tên kuştin; lê lêkolîn û xebatên ku li ser ajalan têne ceribandin serbest in; lewra Îslamopya li ser fitratê hatiye sazkirin.

Li Îslamopiyayê partiyên siyasî nînin. Her bajar an bajarok bi xwe wekîlê xwe û şaredarê xwe dineqîne. Li her bajarî rêvebertiya hemû karûbarê bajarvaniyê weke perwerdehiyê, tenduristiyê, avasaziyê, çandiniyê, avê û ceyranê di destê şaredar de ye. Wekîlên bajêr; li gorî sazûmana Kurdopiya û ji bo hemwelatiyan li meclîsa mezin, qanûnan çêdikin, serast dikin, karûbarên derveyî welêt û kontrola hikûmetê dikin.

Ti kes, kom an hêz nikarin vê sazûmanê xerab bikin. Yên ku hewl bidin ku xerab bikin ji hemwelatiyê têne derxistin û ti carî nikarin bêne wir.

Kurdopya, civaka rizayê ye. Di vê civakê de mirov ji hev razî ne. Mirov ji Xwedê razî ne û Xwedê jî ji wan mirovan razî ye. Lewra ti kes heqê kesî naxwe û mirov, perwerdehiya pirsiyariyê distînin.

Wir Kurdopya Îslamopya ye, ew der nîne. **Pembo nîne em heşêfê dikin, dew tine em rûn difroşin, aqil nîne em kêfê dikin...**



# ÇEND GOTIN LI SER ZANISTÊ

ERSÎN TEK

*"Me fêm kir ku zanist riya herî dawî ya ku ber bi wê ve dimeşe, dema ku gihêştê, behtirê wê jê distîne her çi dabe xwezayê. Me dewsepê(şûnpêk) yên xerîb û ecêb dîtin di qeraxên nedîyariyê de. Ji ber ku nasnameya van dewsepêyan vebêjin me bi pey hev re teoriyên binecih û tekûz afirandin. Û di dawiyê de me ew giyanewerê ku ev dewsepê hiştine dît. Ev çi ye gidî? Ev dewsepê yê me bi xwe ye!"*
(Arthur Eddington)

Di ferhengan de gelek pênaseyên zanistê hene: "Zanist xebata zanînan a bi rêkûpêk e ku gerdûnê yan jî hinek bûyeran ji xwe re dike mijar û hildibijêre, pala xwe dide heqîqetê û bi rêbazên tecrûbî qanûn û prensîban derdiêxe." An jî "Komkirin û sazkirina agahiyan a birêkûpêk e." An jî "Ji xwesteka hînbûna mijarekê ve hereket dike; zanîn û pêvajoya lêkolînên bimetod e ya ku berê xwe dide




armancekê.” Bi rastî ev terîf hemû jî ji kesê ku bi zanistê re mijûl dibe kêm tê û têr nake. Ji ber vê yekê terîfeke zanistê ya tekûz nayê kirin. Divê yek bi yek bête ravekirin.

Dibêjin ku ademîza (benîadem) roja ku hatiye afirandin heta îro daxwaz dike ku gerdûnê nasbike bizane, sirrên wê der bike û bibe serdarê gerdûnê. Ji ber hindê ademîza roja hatî afirandin heta îro bi gerdûnê re şer û pevçûnê dike. Lê belê di vê serdema dawiyê de hinek kes wisa nafikirin. Dibêjin, “Însan bi saya gerdûnê dijî, di navbera wan de lihevkirin û aşitiyek heye.” Li gor qenaeta min ev herdu fikir jî durist in. Wek gotina hinek siyasetmedaran, “Ji bo lihevhatin û aşiteyeke mayinde, divê meriv her dem amadeyê şerekî mayinde be.” Guregura ewran, vedana birûskê, xeyirîna rojê û heyvê, nexweşî, karesat û hwd. ew bûyerên gerdûnê hinek caran bala însên kişandiye û her wisa hinek caran jî tirsandiye. Ji aliyê din ve, ev diyarde, zorek daye însanî ku tirsa xwe bişikêne û meraqa xwe dabîn bike. Dawiya dawiyê hate zanîn ku ji bo şikestina tirsê yan jî dabînkirina mereqa însên divê têgihiştina gerdûnê hebe û însan bibe serwerê gerdûnê. Xasma ev fikir ya mirovê rojavayî bû...

Baş e, sedema şer û pevçûna ademîzayî ya ku li hember gerdûnê pêk tîne tenê ev e gelo? Her wiha, yê hêza zanistê diafirîne ajo(impulse) ye, an jî hinek pêdiviyên mirovahiyê ne?

Helbet ligel tirs û meraqê hin sedemên din jî hene. Minak; xwesteka mirovan (an jî ya civakê) ya serweriyê, xwesteka ecibandinê, xwesteka jiyaneke bextewer û şadûman de bijîn, xwesteka bilind û serdestbunê û hwd. Eva hemû jî ji bo çêkirina zanînê û



pêşketina zanistê egerên cuda cuda ne û pêwîst in. Tirsa mirov, meraqa mirov û hewceyiyên mirov ti caran xelas nabin. Nexwe şerê însên yê ligel gerdûnê (an jî hewldana wî ya aşitiyê) û loma çêkirina zanînê jî tim û tim dê berdewam bike. Warê mijûlahiya zanistê ya sereke gerdûn û rûdawên gerdûnê ne. Divê wateya van bûyeran berfireh bê têgihiştin. Ne bi tenê diyardeyên fizîkî, di warê zanînên çandî, civakî, aborî, ruhî, û hwd. hemû jî ji hedîseyên gerdûnê ne. Bi kurtayî, bûyerên di derbareyê însanî û derûdora wî de hemû hedîseyên gerdûnê ne. Însan roja hatî li ser rûyê erdî û heta îro bi sebr û dildariyeke mezin ve dişuxile ku van fenomenan bizane û wan li gor berjewendiyên xwe bi rê ve bibe. Ew karê ku candarên din neşên bikin ademîza bi hişê xwe pêk tîne.

Zanist xwediyê hêzeke mezin e. Ev sêsed sal e ku di pêvajoya çêkirina zanînê de wesfa xwe, standarta xwe, edetê xwe û kalîteya xwe derxistiye meydanê û bi her kesekî daye qebûl kirin. Tiştê herî girîng ew e ku kar û xebatên ilmî di bindestê kesekî de nîne, bi girêdayê îzna tu kesî nîne. Deriyê zanistiyê ji her kesekî re vekiriye. Heçî kes û saziya ku daxwaz bike dikare bi kar û xebatên ilmî re mijûl bibe. Zanist ti dîn, ziman, nijad û welatan nasnake. Zanist aqil, ked û berhema hemû mirovahiyê ye. Kokên wê heta civakên destpêka mirovahiyê diçe. Lewra ew mijarên ku zanist pê re mûjil dibe cure bi cure ne. Meriv nikare wan mijaran bihejmêre û tesnîfbike. Çêkirina zanîna ilmî ti caran ranaweste. Di dîrokê de key û qralan, siltanan û heta sazî û rêveberiyên dînî qedexe kirine lê hilberandina zanîn û ilmê ranewestiye û naraweste. Di nava vê pêvajoya tekûzbûne(tekamûl) de her roj agahiyên nû, şêwe-warên nû peyda dibin. Ji ber vê yekê, heke teknolojî derfetên çêtir û mezintir dane ber zanistê dê agahiyên nû peyda bibin. Ew agahiyên nû dê bi rê û rêbazên aqlî bêne îspat kirin. Heçî kesê hezbike dê bikaribe her dem van agahiyan bixwîne û biceribîne,

kêrhatîbûn û hêjatiya wan dê derbixe meydanê; agahiyên şaş û xelet dê bêne vebijartin û yên nû cihê wan bigirin.

Zanist di hem jiyana me ya şexsî hem jî ya civakî de bi rêya teknolojiyê gelek tiştan zêde dike, gelek feydeyan dide. Ademîza bi saya zanistê teknolojiyê çêdike û pêşve dibe. Bi saya teknolojiyê dikare jiyana xwe ya li ser rûyê erdî dirêj jî bike, muşkîleyên xwe yên bingehîn çareser bike, jiyana xwe bi her aliyekî ve bikemilîne. Di heman demê de zanist di civakê de hem şêweya hilberînê hem jî hêza hizrî nîşan dike. Ji bilî vê zanistê qîmeteke xwe ya entelektûlî jî heye. Ango zanist hem meraqa însanan hem jî xwesteka zanînê tetmîn dike. Derfetê dide ku însan gerdûnê nasbike û têbigehê. Însan bi saya zanistê heqîqeta xwezayî û civakî fehm dike. Her wiha qîmeteke zanistiyê ya exlaqî jî heye. Wek Lawrence Krauss digot, “Meriv nikare bêje sînorên zanistîyê yên exlaqî tune ne. Çimkî karê zanîstîyê ew e ku rastiyan bîne ziman. Ev tişt tenê bi serê xwe sînorekî cidî ye.” Zanist ji mirovî re paradîgmayekê ava dike, paşî meriv li gor hinek prensîban difikire, li gor doneyên zanistiyê li dinyayê dinihêre û li ser rêya heqîqetê dimeşe. Yanê zanist hiş û feraseteké dide mêriv. Meriv bi hişê ilmî, rast û durist gerdûnê, însanan û meseleyan dinêre û hereket dike. Li hemberî zorî û zehmetiyan, bela û afetan, sebrê dike, li ser hemdê xwe dimîne, saxlem û bitefsîlat difikire. Eva hemû jî taybetmendiyên fezîlet û exlaqê ne. Nêrîna ilmê dê dilpakî û exlaqekî payebilind bide meriv ku eva ne xeyalek e. Însan bi saya nêrîna ilmê dikare hem jiyana xwe ya şexsî hem jî ya civakî bi rêk û pêk bike. Bi vî avayî dikare ji bo civaka xwe xebat û xizmetê jî bike.

Tiştekî din ê girîng jî ew e ku heke civakek her gav teknolojî û rê û dirbên zanistê ji derve wergire û bidest bixe dê ji ber vê bendewariyê her feqîr û deyndar bimîne. Çimkî berdêla vî tiştî pirr giran e. Ji bilî vê di vê civakê de hewlên aqlî û fikrî dê bêencam bimînin, mirovên wî welatî nikarin tiştekî çêbikin û ava bikin, dê her bêfehm, bêhiş û bêfikr bimînin. Nifşên wan yên nû jî dê wisa bin, nikarin li dûv rastiyê biçin, dê bikevin tengasî û xetereyên mezin de. Hem di dîrokê de hem jî di nava jiyana rojane de mînakên vê gelek in.

Mixabin, di ser de îro bidestxistina zanistê bimîne aliyekî, divê tehlîlkirina agahiyên zanistî û bikaranîna teknolojîyê bixwe jî bête kirin. Ji bo bingeha vî karê giran ramana zanistî, fikr û sekneke rexnegir lazim e. Lê belê fikrên rexnegir ne di nav zanîngehan, ne jî di nav pergala perwerdehiya vî welatî de nîne. Heke meriv xwe rexne neke, tenê pergala perwerdehiyê ya heyî sûcdar bike, an jî tenê bi avakirina dersxane û fêrxaneyên modern, bi darxistina sempozyûm û konferansan ti pêşveçûn çênabin. Divê em vê rastiyê bibînin û qebûl bikin.

Divê em pirseke din jî bikin û li dûv bersiva vê biçin...

Kurd li ku dera vê mijarê ne?

Wek her tiştî Kurd di vê mijarê de jî dereng mane. Heta di aliyê zanîstiya nûjen de gelek û gelek dereng man. Çimkî derengbûna dewletbûyîna wan hêj berdewam dike. Heger dewleteke kurdan hebûya helbet dê rewş û pileya wan bi vî awayî nebûya. Eva mijarekî dirêj e. Divê bi serê xwe bê analîz kirin, ji bo gotarek din...



# KRONOLOJÎYEKE REWŞENBÎRÎ Û TÊKÇÛYÎ

DILAZAD A.R.T
dilazadart@gmail.com

**Destpêk**

Bûyer bandorên mezin li ser jiyana mirov û netewan dikin. Bi saya nivîsandinê tiştê ku di dîrokê de çêbûne digihê ber deste mirovên dema me. Mirov çiqas xwe û dîroka xwe nas bikê wulqasî zana û rewşenbîr dibe. An ku ji jiyanê haydar dibê, ji bûyeran ders digrê û di jiyana xwe de li gor van serpêhatîyan tevger dike. Dîrok, mamosteye ji bo mirov û netewan. Pêşeroja mirov û netewa bi dîroka wan ve giredayî ye. Bi ve armance min xwest çend pelên ji dîroka Kurdan derxînim ber ronîye. Ji bo ku em xwe nasbikin û ji bûyêrên nebaş ders bigrin da kû em wan xeletîyan dîsa nekin.

Rêbaza xebata me ne kronolojik e. Behtîr li dor salnameya mîladî roj bi roj e. Di vir de çêdibe ku hin bûyêrên giring me ji bîr kiribin. Ji bo ku li ba Kurdan nivîsandin kêm e dibe ku dîroka hin bûyêran çewtî tê de hebe. Di ve xebatê de şîrove û berfirehîya bûyeran nîne. Tenê bûyer û dema bûyere hatiye nivîsandin. Kesê ku berfirahîya van bûyêr dixwazê dibe lêkolînan li ser van bike. Di vir de armanca me haydar bûna ji dîrokê ye. Ka em bibînîn bê çi anîne serê me an me çi anîye serê xwe.

| | |
|---|---|
| **Çile** | |
| 1.1.1936 | Nave Dersîm kirin Tunceli |
| 1.3.1961 | Bi îdiaya 'avakirina dewleta Kurdistan' 49 rewşenbîren Kurd hatin darizandin. |
| 1.5.1908 | li Stenbolê Rojnameya Kurd Teawûn û Teraqqî derket. |
| 1.6.1963 | li Elihê petrok hate dîtin. |
| 1.6.1995 | li Berlînê Konferansa Zimanê Kurdî çêbû. |
| 1.7.1940 | li Mehabadê kovara Kurdistan dest bi weşanê kir. |
| 1.17.1922 | komkujiya Koçgiriyê çêbû. |
| 1.17.1947 | Komara Kurdistanê ya li Mahabadê hate hilweşandin. |
| 1.17.1995 | Parlementoya Ewrûpayê xelata Saharov da Leyla Zana. |
| 1.19.2001 | li Hollanda Kongreya Aboriya Kurdistan çêbû. |
| 1.21.1926 | li Silêmaniye rojnameya Jiyan dest bi weşanê kir. |
| 1.21.1996 | li Stenbolê rojnameya Azadiya Welat dest bi weşanê kir. |
| 1.21.1926 | Serhildana Hezoyê dest pê kir. |
| 1.22.1946 | Komara Mehabadê hate damezrandin. |
| 1.25.1991 | Tirkî, axaftin û stranên Kurdî serbest kirin. |
| 1.26.2001 | li Berlînê Konferansa Zimanê Kurdî çêbû |
| 1.28.2000 | serokê Weqfa Zehrayê Îzzeddîn Yildirim hat şehidkirin. |
| 1.29.1939 | li Bexdayê yekemin rodyoya Kurdi dest bi weşanê kir. |
| 1.30.1950 | kovara Şark Mecmûasi dest bi weşanê kir. |
| 1.31.1919 | li Stenbolê kovara Kurdistane dest bi weşanê kir. |
| | |
| **Sibat** | |
| 2.1.1992 | kovara Rewşen dest bi weşanê kir. |
| 2.1.1979 | kovara Denge Kawa dest bi weşanêkir. |
| 2.2.2004 | Medya Tv hat girtin. |
| 2.7.2004 | Komeleya PENa Kurd ava bû. |
| 2.8.1914 | li Bexdayê kovara Bangî derket. |
| 2.8.1925 | rexistina Azadî hate avakirin. |
| 2.10.1970 | li Başuê Kurdistanê Yekîtîya Nivîskarên Kurd avabû. |
| 2.12.1945 | bi nave Azadî rêxistinek ji hêla Mele Mistefa Berzanî ve hat avakirin. |
| 2.13.1925 | Serhildana Şêx Saîd dest pê kir. |
| 2.15.1999 | seroke PKK Ebdullah Ocalan hate girtin. |

| | |
|---|---|
| 2.17.1996 | Yekîtîya Rojnamegerên Kurdistanê hat damezrandin. |
| 2.22.1992 | rojnameya hefteyi Welat dest bi weşanê kir. |
| | |
| **Adar** | |
| 3.1.1992 | Weşanxana Nûbiharê dest bi weşanê kir. |
| 3.1.1979 | li Emerîkayê Mele Mistefa Berzanî wefat kir. |
| 3.1.2004 | Roj TV dest bi weşanê kir. |
| 3.2.1994 | parlementerên DEPê hatin girtin. |
| 3.3.1943 | kovara Roja Nû dest bi weşanê kir. |
| 3.4.1925 | li Diyarbekirê Dadgeha Îstîklalê hat sazkirin. |
| 3.4.1929 | li Tirkî, kanuna Takrir û Sûkûn derket. |
| 3.4.1993 | Heyva Sor a Kurdistanê hate demezrandin. |
| 3.5.1975 | li hember Kurdan, Iraq û Îran Peymana Cezayîrê hat mohr kirin. |
| 3.6.1921 | Serhildana Koçgirî dest pê kir. |
| 3.7.1927 | Dadgehên Îstîklalê hatin rakirin. |
| 3.7.1991 | Serhildana Başûrê Kurdistanê li Silemanîye dest pê kir. |
| 3.8.1984 | li Tirkî, li 8 bajarên Kurdan Rewşa Awarte (Olaxanustû Hal) dest pê kir. |
| 3.11.1925 | li Bexdayê kovara Diyarî Kurdistan derket. |
| 3.11.1970 | Başurê Kurdistanê otonomîya xwe bidestxist. |
| 3.13.1974 | Leyla Qasim hate idam kirin. |
| 3.16.1988 | komkujiya Halepçe dest pe kir. |
| 3.17.1993 | cara yekemin PKK agirbesta yekali îlan kir. |
| 3.18.1979 | Arteşa Îranê bajarê Sine bombebaran kir. |
| 3.21.1937 | Serhildana Dersîme dest pê kir. |
| 3.22.1999 | Med TV hate girtin. |
| 3.23.1960 | Bedîûzzaman Saîdê Kurdî wefat kir. |
| 3.23.2006 | li Tirki, cara pêşî weşana TV û radyoye bi Kurdî dest pê kir. |
| 3.26.1966 | kovara Deng dest bi weşanê kir. |
| 3.30.1995 | Yekem televizyona Kurdî Med TV dest bi weşanê kir. |
| 3.31.1947 | Muhammed Qazî û 2 hevalên wî li Meydana Çarçira hatin idam kirin. |
| | |

| | |
|---|---|
| **Nîsan** | |
| 4.1.1968 | kovara Gulistan dest bi weşanê kir. |
| 4.1.1942 | li Şamê kovara Ronahî dest bi weşanê kir. |
| 4.3.1959 | Weşanên PDKê Xebat û Azadî dest bi weşanê kirin. |
| 4.5.1991 | Kurdên Başûrê Kurdistanê (Iraq) ji ber zilma Seddam dest bi derbasbûyîna bakûr (Tirkî) kirin. |
| 4.6.2005 | Celal Talabanî bu serokkomare Iraqê. |
| 4.9.1914 | li Bedlîsê Şêx Şehabeddîn û Seyîd Eliye Hîzanî hatin îdamkirin. |
| 4.9.1992 | kovara Teqlo derket. |
| 4.10.1930 | Kurdî li Iraqê li herema Kurdan bu zimanê fermî. |
| 4.12.1995 | li Ewropa Parmentoya Kurdistanê hate avakirin. |
| 4.14.1925 | li Bedlîse Xalid Begê Cibrî û Yûsif Ziya Beg hatin îdamkirin. |
| 4.15.1925 | Şêx Saîd hate girtin. |
| 4.15.1963 | kovara Deng dest bi weşanê kir. |
| 4.18.1992 | li Stenbolê Enstîtûya Kurdî vebû. |
| 22.04.1898 | li Kahîre yekem rojnameya Kurdî, Kurdistan dest bi weşanê kir. |
| 4.22.1940 | li Ramanê petrol hate dîtin. |
| 4.22.1994 | li Berlîn Enstîtûya Kurdî vebû. |
| 4.28.1937 | Elî Şêr hate qetilkirin. |
| 4.29.1918 | rojnameya Pêşkewtin derket. |
| | |
| **Gulan** | |
| 5.3.1943 | rojnameya Roja Nû li Beyrûde dest bi weşanê kir. |
| 5.4.1995 | Dayikên Şemiye cara yekemîn çalakîya rûniştine dest pe kirin. |
| 5.5.1932 | li Tirkî ji bo Kurdan, kanuna Îskana Mecbûrî derket. |
| 5.6.1958 | Mele Mistefa Berzanî ji Yekîtîya Sovyetan vegeriya. |
| 7.05.1639 | Peymana Qesra Şîrîn hat mohr kirin. |
| 5.7.1993 | DEP hate avakirin. |
| 5.10.1946 | Radyoya Dengê Komara Mehabad hate avakirin. |
| 5.11.1919 | Serhildana Elikê Bate derket. |
| 5.15.1932 | kovara Hawar dest bi weşanê kir. |
| 5.16.1926 | Serhildana Agiriye dest pê kir. |
| 5.17.1992 | rojnameya Azadî dest bi weşanê kir. |
| 5.20.1929 | Serhildana Geliye Zîlan dest pê kir. |

| | |
|---|---|
| 5.21.1919 | Serhildana Şêx Mehmûdê Berzencî dest pê kir. |
| 5.22.1969 | DDKO hate damezrandin. |
| 5.24.1999 | KNK (Kongreya Neteweyî Kurdistan) hate damezrandin. |
| 5.26.1927 | Serhildana Motikan û Sasonê dest pê kir. |
| 5.26.1913 | komelaya Hêvî hate damezrandin. |
| 5.27.1947 | Meşa Mezin ya Mele Mistefa Berzanî dest pê kir. |
| 5.29.1971 | Seîd Elçî hat kuştin. |
| 5.30.2000 | li Tehranê Yekemîn Konferansa Zanistî ya Zimanê Kurdî hat lidarxistin. |
| 5.31.1946 | li Gimgim û Xinûsê erdhej çêbû. |
| | |
| **Hezîran** | |
| 6.1.1960 | li Tirkî, 485 zana û rewşenbîrên Kurd sirgunî Sêwasê kirin. |
| 6.1.2005 | Şêx Mihemed Maşûq el-Xeznewî hat şehîdkirin. |
| 6.1.1975 | Celal Talabanî YNK ava kir. |
| 6.5.1971 | li Diyarbekir petrol hat ditin. |
| 6.6.1913 | Kovara Rojî Kurd dest bi weşanê kir. |
| 6.7.2015 | li hilbijartina Tirkî, HDP, 80 parlementer şiyand meclisa Tirkî. |
| 6.10.2004 | TRT dest bi weşana Dimilî kir. |
| 6.11.1922 | Şêx Mehmûdê Berzencî xwe kralê Kurdistanê îlan kir. |
| 6.12.1966 | temelê bendeva Kebanê hat avetin. |
| 6.14.1920 | Serhildana Eşîra Millî dest pê kir. |
| 6.15.1909 | Rojnameya Peyman derket. |
| 6.16.1994 | li Tirkî partîya DEP hate girtin. |
| 17.06.1921 | Serhildana Koçgirî  têk çû. |
| 6.18.1919 | Îngilîzan Şêx Mehmûdê Berzencî sirgunî Hindistanê kirin. |
| 6.19.1924 | Silemanî ji hêla Îngilîzan ve hat dagirkirin. |
| 6.23.1963 | Şêx Merûf Berzencî û 28 hevalên wî hatin îdam kirin. |
| 6.28.1943 | Rêya hesin dinavbera Diyarbekir û Êlihêde dest bi seferan kir. |
| 6.29.1925 | li Diyarbekir Şêx Seîd û 46 hevalên wî hatin idam kirin. |
| | |

| | |
|---|---|
| **Tîrmeh** | |
| 7.6.1992 | li Iraqê Hukûmata Kurd ava bû. |
| 7.13.1960 | Gora Bedîûzzeman vekirin û cesede wî birin cihekî nedîyar. |
| 7.13.1988 | Ebdurrehman Qasimlo û 2 hevalên wî hatin qetilkirin. |
| 7.15.1964 | PDK-T hate damezrandin. |
| 7.20.2015 | li Pirsûsê di encama teqînekê de 30 mirov zêdetir hatin kuştin. |
| 23.07.1784 | li Erzincanê erdhej çêbû. |
| 7.24.1920 | Peymana Lozanê pêk hat. |
| | |
| **Tebax** | |
| 8.5.1960 | Dewleta Surî 5000 kesên endamên PDK-S girtin. |
| 8.7.1924 | Serhildana Nasturiyan dest pê kir. |
| 8.10.1920 | Peymana Sewrê hat îmzakirin. |
| 8.15.1984 | PKK dest bi şerê çekdarî kir. |
| 8.16.1948 | PDK-Î hate damezrandin. |
| 8.17.1964 | li herêma Hemşo ya bajarê Sêrtê petrol hate dîtin. |
| 8.20.1988 | Şerê navbera Îran û Iraqê bi dawî bû. |
| 8.28.1974 | li Bendava Kebanê hilberîna elektrîke dest pê kir. |
| 8.30.1995 | li Ewropa Konfaransa Jinen Kurd pêk hat. |
| | |
| **Îlon** | |
| 9.4.1993 | Mehmet Sincar û hevalekî vî li Êlihê hat qetilkirin. |
| 9.6.1962 | li Îdirê erdhej çêbû. |
| 9.6.1975 | li Licê erdhej çêbû. |
| 9.10.1959 | Yekem Konferansa Mamosteyên Kurdistanê li Şeqlewa dest pê kir. |
| 9.11.1941 | li derdora Gola Wanê erdhej çêbû. |
| 9.19.1909 | li Stenbolê Cemîyeta Kurd Teawun û Teraqqî hat damezrandin. |
| 9.20.1992 | Musa Anter li Diyarbekir hat kuştin. |
| 28.09ê.1991 | li Stenbolê Navenda Çanda Mezopotamya ava bû. |
| | |

| | |
|---|---|
| **Çiriya Pêşîn** | |
| 10.1.1992 | Kovara Nûbihar dest bi weşanê kir. |
| 2.10.1187 | Selaheddîn Eyyûbî Qudûs bidest xist. |
| 10.4.1992 | li Başûrê Kurdistanê, Dewleta Federal ya Kurd hate damezrandin. |
| 10.6.2014 | li Bakûrê Kurdistanê ji bo piştgirîya Kobanê çalakî destpêkir. Nêzî 50 mirov hate qetilkirin. |
| 10.14.1989 | li Parîsê Konferansa Kurdî dest pê kir. |
| 10.19.1960 | ji bo 155 mirovên Kurd biryara sirgûne derket. |
| 10.22.1937 | Serhildana Dersîmê têk çû. |
| 10.23.2011 | li Wanê erdhej çêbû. |
| 10.24.1913 | kovara Hatawî Kurd derket. |
| 10.26.1926 | li Qersê erdhej çêbû. |
| | |
| **Çiriya Paşîn** | |
| 11.1.1943 | li Surî rojnameya hefteyî Stêr derket. |
| 11.7.1918 | Kovara Jîn derket. |
| 11.13.1960 | Sinema Amûde şewitî. 283 kes mirin. |
| 11.16.2000 | Ahmet Kaya li Fransa di sirgûne de mir. |
| 11.18.1937 | Seyid Riza û 11 hevalên wî hatin îdam kirin. |
| 11.26.1971 | Doktor Şivan (Saîd Kiziltoprak) hate kuştin. |
| 11.27.1978 | PKK ava bû. |
| 11.27.1998 | Kurdistan TV dest bi weşanê kir. |
| | |
| **Kanûn** | |
| 12.12.1980 | ji rêxistina KAWA 15 kes li Qamişlo hatin kuştin. |
| 12.14.1914 | Şêx Ebdusselam Berzanî li Musilê hate îdam kirin. |
| 12.17.1918 | Kurd Tealî Cemiyetî hate avakirin. |
| 12.18.1996 | Eyşe Şan wefat kir. |
| 20.12.820 | wefata Îmamê Şafiî. |
| 12.27.1939 | li Erzincanê erdhej. 40 hezar kes mir. |
| 12.27.1944 | Tirkî nave Çebexçûr (Çewlîk)ê xiste Bîngol. |
| 12.28.1991 | rojnameya hefteyî Rojname derket. |
| 12.28.2011 | li Roboskî 34 mirovên Kurd bi erîşekê bombayî hatin qetilkirin. |

## Encam

Wek ku te xuyakirin dîroka Kurdan dîrokeke têkçûyî ye, dîrokeke şikestîye, dîrokeke birîndar e. Lê li hember van têkçûyîna jî dîrokeke berxwedanê ye, dîrokeke serhildanê ye, dîrokeke rewşenbîrî ye jî. Di vê xebatê de 3 tişt zêde tê dîtin.

1. Ji aliye azadîye ve; serhildanên têkçûyî.

2. Ji aliye rewşenbîriye ve; derxistina kovar û rojnameyan û avakirana dezgeyan.

3. Ji alîye tekoşîne ve; îdam û qetilkirin û kuştin.

Wek dî her şeş mehê pêşî di dîroka Kurdan de cihekî taybet digre. Ji % 80 bûyer tenê di nav van her şeş mehên pêşî de çêbûne. Bi taybetî mehên biharê gelek bûyer çêbûne.

Di vê xebatê de bûyêrên di Kurdistana ku dinav Tirkî, Sûrî, Irak û Îranê de û ê Ewropa qewîmîne bi awayekî giştî hatine rêzkirin.

*Nisêbin, Mêrdîn, Elih, Amed, 2021*



# LÎSTEYA PIRTÛKÊN ZAROK Û NÛCIWANAN

ÇANDNAME

Ev lîste ji kampanyaya pirtûkxaneyekê hatiye wergirtin. Bi hevîya ku jê sud werê girtin.

Zarok û Ciwan pêşeroja me ne. Bê çawa em li ser bermayîyên paşiya xwe zanîna xwe pêştedir dibin yên li pêşîya me jî wê ji van xebatên ku îro em dikin sud werbigrin û zanîna xwe zêdetir bikin.

Bi vê hincetê me xwest bo zarok û nûciwanan vê lîsteyê li vir biweşînin. kesên ku bi navê kampanya an reklamê qîmetê vê lîsteyê paşguh kiribin hevî dikin ku li vir bibînin û li gorî qîmetê wê qîmetê bidinê û rêz bi rêz bixwînin, bidin xwendin û van berheman bo zarok û ciwanan bikin diyarî.

Hevî dikin wek kampanyayekê her kes bo zarokên xwe van berheman bikirê û li malên xwe pirtukxaneyeke zarokan bi zimanê kurdî ava bikin.

**Weşanxaneya Apec**

1. Ansîklopedîya Zarokan
2. Findo Cihê Dibe (Sven Nordqvist/W: Mahmûd Lewendî)
3. Hirça ku ji Lazût Hez Dikir (Bilal Görgü&Ulf Löfgren)
4. Pippiya Goredirêj li Humlegardenê (Astrid Lindgren)
5. Seta Hoste Memo (George Johanson&Jens Ahlbom/W:)
6. Seta Manga Sor (Jujja Wieslander& Sven Nordqvist/W:Amed Tîgrîs)
7. Seta Rindo (Ulf Löfgren/W: Mahmûd Lewendî&Xebat Aref)
8. Seta Emmayê
9. Lîsa Otobusê Dipê (Sven Nordqvist)
10. Seta Morîs (Lotta Olsson&Maria Jönsson/W: Amed Tîgrîs)
11. Seta Ture (Anna-Clara&Thomas Tidholm/W: Rewşen Tunç&J İhsan Espar)
12. Seta Tûte (Gunilla Wolde/W: Amed Tîgrîs&J İhsan Espar)
13. Ma Tu Mam Mendo û Findo Nas Dikî? (Sven Nordqvist/W: Amed Tîgrîs)

**Weşanxaneya Hîva**

1. Sêgoşe û Çargoşe (Roza Metîna&Murat Yapıcı)
2. Bajarê Moriyan (Yehya Elewîferd)
3. Çîrokên Kundirîkê (Benûşe Elewîferd)
4. Şînmorîka Zînê (Berfîn Ayşe Öğüt)
5. Kewên Gozel (Berfîn Ayşe Öğüt)
6. Batirsok (Mem Bawer&Abdullah Yapıcı)
7. Asmîn û Bilbil (Yasemîn Elban)
8. Seta Birayên Grimm
9. Mîro û Hevalên Wî (Mem Bawer)
10. Rodî (Mehmûd Nêşîte)
11. Ferhanga Min a Kurdîya bi Wêne (Azad Yüce)
12. Bajarê Zarokan (Rustem Felat)

## Weşanxaneya Morî

1. Mam Rovî (Rindê Polat&Ahmed Bîrî)
2. Pîrê û Çûçê (Rindê Polat&Ahmed Bîrî)
3. Şahmaran
4. Nûtiya Xweşik (Yehya Elewîferd)
5. Çîrokên Kundirîkê-2 (Benûşe Elewîferd)
6. Pîrê û Dîko (Rindê Polat&Ahmed Bîrî)
7. Rovî û Legleg (Rindê Polat&Ahmed Bîrî)
8. Şengê û Pengê (Rindê Polat&Ahmed Bîrî)
9. Hitokê û Papuşko - Çêlek û Şîr (Newaf Mîro)
10. Hitokê û Papuşko – Duçerxe
11. Hitokê û Papuşko – Pisîk
12. Hitokê û Papuşko – Serşûştin
13. Hitokê û Papuşko - Dara Noel Baba
14. Hebhinarê
15. BENDAR- Kehaneta Sêmenda (Hekîm Atay)
16. Masîreşê Biçûk (Samedê Behrengî/W: Mehdî Jafarzadeh)
17. Kilîle û Dimne (Beydeba/W. Sadiq Reşwan)
18. Hitokê û Papuşko – Dîno
19. Hitokê û Papuşko - Baxçeyê Zarokan
20. Hitokê û Papuşko – Dîlan
21. Hitokê û Papuşko - Gula Berbiroj
22. Hitokê û Papuşko – Nexweşî
23. Kêzxatûn (Rindê Polat&Ahmed Bîrî)
24. Xeyaletê Cantervilleyê (Oscar Wilde/W:Rewşen Rojistanî)
25. Çivîka Zêrîn (Brüder Grimm)
26. Mîrze Miheme
27. Warê Leglegan (Îsmaîl Dîndar)
28. Pîrê û Rovî (Eskerê Boyîk)
29. Mîrmorîk
30. Çîrokên Andersen (W: Nesrîn Rojkan)
31. Mîr Morîk (Eskerê Boyîk)



**Weşanxaneya Nûbihar**

1. Seta Daristana Şêrîn (Seyhan&Mahmut Karakoç)
2. Zozan û Gernas (Çetoyê Zêdo)
3. Ejderyayê Tirsonek (Çetoyê Zêdo)
4. Gurê Kubar (Çetoyê Zêdo)
5. Daweta Noko û Nîsko (Çetoyê Zêdo)
6. Kulîlk (Gernas Koçer)
7. Çîrokên Serkeftinê-1 (Îzzettîn Seven Marînûsî)
8. Çîrokên Serkeftinê-2 (Îzzettîn Seven Marînûsî)
9. Çîrokên Serkeftinê-3 (Îzzettîn Seven Marînûsî)
10. Çîrokên Serkeftinê-4 (Îzzettîn Seven Marînûsî)

**Weşanxaneya Avesta**

1. Stêrka Piçûk (Murad Dildar)
2. Dara Sêvê (Murad Dildar)
3. Qesra Spî (Murad Dildar)
4. Conî û Cimêma (Bryan Guinness/W:Celadet Bedirxan)
5. Of Of (Şukran Çaçan)
6. Alfabe (Mustafa Uzun)
7. Newroz (Mustafa Uzun)
8. Elfabeya Min (Kamiran Alî Bedirxan)
9. Navê Te Dinivîsim Azadî (Paul Eluard)
10. Baxçeyê Heywanan (Ghislain Zuccolo)
11. Serpêhatîyên Tom Sawyer (Mark Twain/W: Ergin Öpengin)
12. Deqên Leopar (Rudyard Kipling)
13. Dilê Kurên Min (Kamiran Alî Bedirxan)
14. Serpêhatîyên Alice eli Welatekî (Lewis Caroll/W: Ciwanmerd Kulek)
15. Mîrzayê Piçûk (Antoine de Saint-Exupéry/W: Fawaz Husên)

**Weşanxaneya Dara**

1. Serê Şevê Çîrokek (Selîm Temo)
2. Guldesteyek ji Çîrokên Samed Behrengî (W: Cafer Açar)

**Weşanxaneya Sîtav**

1. Çîrokên Ezopî (W: Sidîq Gorîcan)
2. Prensê Bextewar (Oscar Wide)
3. Ji 20 Welatan 20 Çîrok (W: Amed Tîgrîs)
4. Kartên Jîran (Qahir Bateyî)
5. Seta Perwerdehîya Zarokan (Adar Jiyan)

**Weşanxaneya Lîs**

1. Gureqûm (Asa Lind/W: Serkan Birûsk)
2. Azad (Mîran Janbar)

3. Berfînxan û Her Heft Bejnbihost (Jacob û Wilhem Grimm/W: Bihar Mirad)
4. Alfabeya Kurdî (Cemşîd Çiftçi)
5. Masîyê Reş î Biçûk (Samed Behrengî/W:Xalis Xerzan)
6. Dayîk Amîda (Şehmus Diken/W: Mem Wenda)

**Evrensel Basım Yayın**

1. Robînzon Krûzo (Daniel Defo/W: Cerdoê Gênco)
2. Pînokyo (Carlo Callodi/W: Türkan Tosun)
3. Axiriya Nes (H. Tûmanyan/W: Casimê Celîl)
4. Bihar (Emînê Evdal/W: Casimê Celîl)
5. Çîroka Masîgir û Masîya Zêrîn (A.S. Pûşkîn/W: Casimê Celîl)
6. Gikor (H. Tûmanyan/W: Emînê Evdal&Hecîê Cindî)
7. Mişka Pişîkê ra Çawa Şer Kirin (Xinko Aper/W: Casimê Celîl)
8. Nezerê Mêrxas (H. Tûmanyan/W: Casimê Celîl)
9. Se û Pişîk (H. Tûmanyan)
10. Teyr û Tû (H. Hayrapêtyan/W: Casimê Celîl)
11. Siwarê Ewran (Îsmaîl Dîndar)
12. Xweyî û Xulam (H. Tûmanyan/W:Casimê Celîl)

**Weşanxaneye Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê/Amedê**

1. Pirtûka Destpêkê (Eşref Keydanî)
2. Pirço (Orhan Budak)





# HER XALÎ BI ÇÎROKA XWE VE DIHAT, BI ÇÎROKA XWE VE DIÇÛ

FAIK OCAL

Bi heşt Tomaqan ve di kûrahîya dilê xêlî de ber xwe didim.

Her Tomaqek ji bîst û du doran çêdibû.

Tim li hawîrdorê min çar Gol hene.

Bi dê û amojina xwe ve di nav golê de bi Tomaqê Nehdor ve ajneyan didim.

Li çaraliyê min du Hemêliyên Pêncdor û du Alsêvikên Pêncdor hene. Tim dayîka min efonek e, amojina min hurim e.

Du sir, du rez, du ezmûn ketine pêşbirkê, gorra ûmrê hevdu dikolin.

Li hawîrdora min çil Nîk û her nîk ji pênc doran çêdibû. Nikarim ji golê derkevim, nikarim ji qedera xwe dûr kevim, nikarim ji kedera xwe birevim.

Dayîka min dişibe êşên ciwaniya min, amojina min dişibe kêliyeke bexteweriya kurikiya min.

Ji bo wê tim li hember qeder û kedera xwe stûnerm bûm.

Ji bo wê dayîka min û amojina min navê min danîbûn, Stûnerm.

Stûnerm were vir, Stûnerm here wir.

Herdu hevalan tim suxreyên xwe bi Stûnermê xwe dikirin. Ez ji Stûnermbûna xwe razî bibûm; çimkî dayîka min zimanê xewnan, amojina min zimanê çîrokan bi min hîn dikirin.

Piştre kalê min dihat bi Mishefa xwe ve Çavikên Hemêliyê Pêncdor bi girîyê xwe tijî hêsir dikir. Hemêlî radipêça, radimûsa û ji bendewarên xwe re dişand kalê min. Ez di ber xwe de digiriyam, diqehirîm, dibehecîm.

Di her Hemêliyê de şeş çavên min, şeş çavdêrên min, şeş çavlirêyên min, şeş hêvîyên min, şeş hesretên min, şeş bendewarên min hebûn.

Her ku min hewl dida xwe bîst û du Tomaqên Kênarê li rûyê min diketin.

Li ser piştê gêrrî golê dibûm.

Halê dayîka min, amojina min ji yê min ne baştir bû. Çar Şivikên Golê ji min gelek dûr bûn.

Aqilê min nedibirrî ku rojekê ez ê bigihêjim Şivikên Golê, bi Şivikên Golê ji gola xêlî derkevim û herim.

Piştre şev dibû û Duşarkên heyştdeh di ser min de dibarîn.

Di her golê de şeş Duşark, di her xêlî de bîst û çar Duşark hebûn.

Duşarkên ku dişibiyan Stêrka Dawid Pêxember, Duşarkên ku dişibîn Taca Îsa Pêxember, Duşarkên ku dişibîn Raza Mûsa Pêxember, Duşarkên ku dişibîn Hîva Mihemed Pêxember.

Roj diçû ava, tarî diket erdê, şevê kona xwe vedigirt, ûmir dibihûrin, lê dawîya Duşarkan nedihat.

Min bi keserên kûr ji bîra kurikiya xwe dikir.

Dê û amojina min dihatin hawara min.

Ji min re digotin: "Bi Duşarkê xwe ve, xwe berde kûrahiya dilê golê, hingê tu yê rehet bibî, sekin bibî, azad bibî." Min dipirsî: "Bi kîjan Duşarkê ve?"

Wan bersiv dida: "Duşarkê ku dişibe te."

Min li hawîrdora xwe dinêrî, lê tu Duşarkên dişibiyan xwe nedidît. Weng di cîh de destvala dimam. Piştre dê û amojina min dihatin ba min û Stûrnermê xwe aş dikirin. Dayîka min bi denga xwe yî efonek xewnên xwe ji min re digotin, amojina min bi denga xwe yî hurim çîrok ji min re digotin.

Bi Hêlanên dişibiyan kuliyên berfê diketim.

Di xalîyekî de çil û heşt Hêlan û her Hêlan jî bi sî dorî çêdibû ku ji Hêlanan filitîn mumkin nedibû; çimkî di her xalîyekî de çîrokek, di her çîrokekê de xalîyek hebû, çîroka her xalî yî cûda bû.

Her xalî bi çîroka xwe ve dihat, bi çîroka xwe ve diçû.

Li her derê golên Qilçên Heftreng, Qilçên Pozxwar, Qilçên Pêncdor hebûn.

Dizokên Çardor li ber qilçan diçûn û dihatin.

Me dengê xwe nedikir.


Me nediwêrî dengê xwe derxista.

Çar gol mîna çar celadan li hember me bûn.

Çarçira tenê navek, xeyalek, leylanek û êşek bû.

Qeder û kederan, çiraya bext û jiyana me ji mêj ve vemirandibû.






DESTAR
PIRTÛK / KİTAP

# DEST BI XIZMETÊ KIR


Projeye "DESTAR | Pirtûk/Kitap" ji bo weşanên çapkirî an dîjîtal ji ser înternetê bi awayekî ewle û rêkûpêk ji hilberîner bigihê xwîner hatiye damezirandin û pêşdebirin. Projeya me xebatên bazirganiya elektronîk yên "Destar Cafe"ya ku li Enqerê xizmetê dide birêve dibe. Projeya me di Gulana 2021an de dest bi xizmetê kir û hêvîya me ew e ji bo xwendekar ceribandineke danûstandinê ya bi qalîte û nû pêşkeş bike.

Reklam

# Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bînê ba hev, bingeheke sazîtiyê bide kovargeriya kurdî, kovargeriya kurdî hem bi sewirandinê hem bi naverokê bi pêş de bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev re çareser bike hatiye damezirandin.

## Kovarên Endam




/KovargerenKurd
KovargerenKurd@gmail.com

# ÇANDNAME

Endama Koma Kovargerên Kurd e